SÎYABENDÊ
SEMEND



# SÎYABEND Û XECÊ

*SÎYABENDÊ SEMEND*



# *SÎYABEND Û XECÊ*

*(Poema Civata Kurdî)*

**ROJ**

*P*oema "Sîyabend û Xecê" ya Sîyabendov Semend Alîevîç yê ku li ser bingeha yek ji varyantên Destana gelerî ya Sîyabend û Xecê hatîye afirandin, tevî parastina me xweserîya afirandinî, bi hinek guhertinên nivîsarî û rêzimanî ve ji kurmancîya latînî ya îroyîn re hatîye adaptekirin.

***W. ROJ***. Sofya, 1995
Ji kîrîlî transkrîpe: J. Silav

Çapa yekem: Aypetrat 1959 Erîvan
Redaktor: Qaçaxê Mirad
Wêne: L. Berberyan

## PAR I

Bihar bû, bihar, gul-sosina bîndabû,
Ji baranê, kesksorê şax vedabû,
Avêd berfêd belekîya pêldida,
Ji qûntarêd çîya dikişîya.
Pêlêd sipî diketine nav gelîya,
Dilezyan, xwe digîhîandine çayra,
Xwe digihîande deşt û zozana,
Nolî kamçûyê dest huba yara.

Bîna cinetê ketye mêrg-çîmena,
Çîya xweşkiribûn bengzê zozana,
Dinîya ji xewê rabû tevi rihana;

Gundîyê Silîvîyê bi sûrîyê qerqaş,
Bi koç-berxane, bi kilamêd zef xweş,
Rêyêd Sîpanêye bedew, rêyêd Sîpanêye dirêj
Dikişyan nola lêmiştê, nolî kilamê dengbêj.

Komê qîzaye bedew, wir nolî gogerçîn,
E'wtîna kelba-qurtîn û qûjîn,
Û xortêd bedew, kû rûniştîye nav zîn.

Ew diçûne çîyê ji dest germa deştê,
Û ji berbanga sibê, hetanî evarê,
Bi kilam û xeberdan ketibune rê:

Lê-lê, weylê,
Vî erdî, Vî ezmanî,
Vî derdî, bê dermanî,
Bilbilê malşewitî
Ser belgê darê dixwîne,
şest û şeş zimanî.

Lê-lê, teresê, teres bavê,
Tuyê xelqê ra kêf-henek laqirdîyanî,
Min evdalî ra kêr bi dûzanî,
Tu ramûsanekê bide min pismamî.

Bûkê salê, kevanîyê malê,
Kevoka berî palê,
şekirê nav desmalê
Belekîya ji berwarê,
Teva havînê dayê,
Ji jor da helîya hate xwarê.

Xezalê vê newalê,
Kêvrûşka li vê palê,
Birincê deşta Erebistanê,
Kişmîşê deşta Erebistanê,
Serdilka dilê min evdalî.

Lê werdê ha werdê,
Av sar e, tasê werdê,
Bire siyarê me sîyar bûne,
Dilê min ra çûne cerdê.

Ew dilîvîn bin p'eltê ewra,
Kû tenê teyra kiribûn cîyê seyra,
Wekî ew rûh û canê kesirî,
Emrê ber germê tû nesitirî,

Here serê çîyê ewra hemêzke,
Kîn û kulê xwe erşa ra veke.

Li roavayê nolanî gindor,
Teva sincirî, nolî kûra sor,
Xatirê xwe xwest bere-bere,
Dapalîya piş çîyayê lapî sere,
Û warê xwe hişt bo şevereşê.

Ew koçêd dirêj sekinîn fêza rê,
Berxanê giran danîne erdê.
Boy vegirtina kon digeriyan cîyê xas
Hinek digerîyan, kurê xweye nes,
Ku paşketibûn, boy wan, her ciya yek,
Dibe ku wan dajot peza xwe kulek,
Dilê dê-bavê xwe ne kevir e,
Boy ewledê xwe tu nastir e.

Lê kulfetê kurd-ewê canpolat,
Ewê dilbirîn, ewê dilşevat
Cem wêya tune dexestî, kelptî,
Bona wê tune keser, rihetî,
Ew zû top dike dor-bera qirşa,
Kuçik datîne bin perê erşa,
Hevîr distirê û loşê sêlê
Zû bela dike boy şîva êlê.

Hin vir, hin dera han, bi yekbangî,
Li tev stêrka bêhesab û hezar rengî,
Agirê kuçika nav çola şuxulî,
Bêhna nanê loş, goştê qelandî,
şîrê teze dotî, hewa hingavtî.

Hetanî banga dîkê nîvê şevê,
Deng û hesta koçervanê ber hewê,
Cî-cîya dûr, nêzîk dihat, hewa dihejand,

Guhdarîya merîya ber bi xwe dikşand.
Hela pişt topikê şîn piste-pist bû,
Kêleka zinara, serfêza kanîya.
Hela cî-cîya dihat dengê dilketîya.

Lê xênî şivan û xênî gavan
Û kelbêd gurêx— ew hunirê wan,
Her tişt xewra çû, her tişt seqirî,
Sihetek-dudo ser wan ra firî.
Hê teze kew ketibû sibê,
Leyl û Mecirûm derketin qulbê,
Koçervan ji xewa şîrîn zû rabûn,
Koçê wan nola zincîrê rêzbûn,
Xatirê xwey çûyînê jî zozana xwestin,
Qîz û bûka bi zelûlî kilam digotin:

"Zozanê me pir kanî ne,
Kulîlkê wana hêsirê xort û qîza hildiçîne,
Xwezila min wî bendîbe, kî çeva dibîne,
Dilekî na hezar dilî dihebîne,
Xortê tûsizi ra diçe dibe bermalî,
Çîya û zozanno, werin me vî halî,

Bira ew pêşî xêrê wayê qet nebîne,
Kê edet hinart şermê ser me da tîne,
Wekî dergîstî ne bi dilê qîzê be, qîz nestîne,
Lê wekî bistîne, ew ser serê wê, nolî ruhîstîne,
Ne bi dilê xwe ew diçe dibe bermalî,
Çîya û zozanno, werin me vî halî".

Hela şînayî ji qiravîyê zuha nebûbû,
Hema wê demê pîreke belengaz wê derê peydebû,
Mêşok hildabû bi kincêd qerpal,
Ji gundê nêzîk ew derketibû ji mal.

Koçervan paşî rihetbûna şeva giran,

Koçervan paşî rihetbûna şeva giran,
Hêdî ji cî leqîyan û rêketin,
Pîreke belengaz, bêxweyî û xudan
Ji dewsa konekî, diçû dewsa konê din,
Wekî çarekê halê xwey belengaz bike.

Ji belengazîyê sihet xişimî,
Ser û sûretê wê temam qirçimî,
T'imê tunebûn ber belengaza,
Ber bi dewletîya naçe, naxweze.

Pîra belengaz hatibû parsê,
Destxe zîtolê kevne libasê,
Yanê parî nan, yanê gorekê,
Ji dewsa warê kon colekê.
Lê nişkêva wê vir dengek bihîst,
Dilê pîrê zû davît û dilîst,
Ew nolî dîna, ew nolî sema,
Kaseke dest da li cîyê xwe da ma,
Ricifîn vira dest û pê wê,
Ji dest dengê zarê, ji destî sawê.

Girîna zarê dihat û dihat,
Pîrê çevê xwe wan dera gerand,
Wê ji gûhê xwe qet bawer nekir,
T'irê çivîk bû, dûrva gazîkir,
Guhdarî neda, got: „Guhê min sistin,
Qajîna teyra min tirê zare".

Lê gera xwe wê dîsa destpêkir,
Dengê girî dîsa dûrva ducar kir,
Pîrê gazî melekêd qencîyê kir,
Hêdî-hêdî xwe nêzîkî deng kir,
Û nav p'elaxa hetanî çoka,
Wê dît pêçeka zara bişkoka.
Ew zar ewê ji erdê hilda,

Û pêçeka wî zû-zû wê vekir,
Destê wî ji kincik benika azakir,
Ewî xurtik bû, nolî sêva sor,
Nola belekiya, nola hinara mor.

Pîrê lê meta mabû, dil lê şabû,
Çaxê dest û lingê wî ji pêçekê azabû,
Ewî dest û lingê xweye azay bakir, şabû,
Ew nedigirîya, na, qet nedigirîya,
Te digot qey ewî şikîyat dikir,
Wekî ew hìştine quntara çîya
Û wî reca dikir ji emrê xweyî aza.

Bi umday ew zar hemêz kir,
Nolî dîya helal rûyê sor paçkir.
Ne ew jî dê bû, dilê wê bû kizîn,
Kî zane, kê bû dîya kurikê evîn,
Kî bû bavê wî, yane bêbav bû,
Dest tunebûnê, dest çi sexîrîyê,
Dê-bav zar avît nav zelûlîyê.

Zûda bû, hela gelek zûda,
Wexta sexîrtîyê derê wê kuta,
Ji bextê pîrê wira bû bager,
Bagerê sotin pîrê dil-ceger,
Mêrê wê kuştin, ew mane êtim,
Ber dergê xelqê, ew birçî û tî.
Nava salekê zarê wê binevş
Hemû wefat bûn dest xuryê reş.
Û ew tenê ma, nolî dara bî,
Bê kur û qîz û timî birçî.

Niha dîsa careke mayîn,
Bû xweyê zarê û gula wê geşbû,
Dilê wê şa bû, ew bextewar bû,
Zar bire holika xweye binerd, tarî,

Zû av lêkir û pêra, şa bû.

Jêra bi dilê xwe kincik dirût.
Kire colangê, jêra kilama kurî got,
Çimkî ewê ew dîtibû ser rê,
Serê riya şêr û egîtêd Sibhanîyê,
Bona nav û dengê wane mêranîyê.

Dayik:— Lorî lao, tu li erda egîta,
Lorî lao, tu bibe zor mêrxasê cimaeta,
Deşta Silîvê, wê bi çaîr e,
Tu mezinbe nolî fêriz e,
Lawê xurtik mezinbe, çawa egît.

Çi desmala gulî-gulî,
Tijî sêv û tirî,
Para kurkê minî xurtikî,
Çîya negere, çîya sarin,
Pê gula neke, ji xwe bêzarin
Ez û kurê xwe van şênkaya bigerin.

Keser dilê min çû xarda,
Sazbend sazê xwe anî jorda,
Nizam îsal çi got, çi xeberda.
Kurkê min î nezan e û bêxem e,
Dayik dilorîne, dilda xem e,

Lorî, lao, lawê min kurîne,
Lorî, delalê min î kurîne,
Êla me wê bi stirîne,
Ezê navê lawê xwe deynim
Sîyabendê Silîvîye.

Navê tifal danî Sîyabendê Silîvîyê,
Kurê çê, delalîyê pîrê.
Û pîrê ji dîtina Sîyabend şûnda,

Ro-bi-ro cahil dibû, gul vedida,
Ro-bi-ro siheta teze,
Dilê wêy remda dibeze.

şev û ro, ber vî derî û wî derî,
Xebata xelqêye girane çetinî,
Xwe ra bi zelûlî ew mezin dikir,
Nola kulîlka pê şadibû û bîn dikir,
Bi ruhê egîtîyê fêriz terbet dikir.

Sîyabend bin destê pîrikêy remda,
Zû mezin dibû û guldida,
Ew hela heft salî tinebû,
Ji nav zarê çaxê xwe ra berbiçev bû.
Bi qewetê û çapkîyê va ew xofa gişkabû.

Çaxê Sîyabend bû dehsalî,
Herro cinar, herro gundî,
Dihatin bal dîya Sîyabend şikîyat:
— Rayê bike kurê xweyî har,
Ew rojê serê yekî dişkêne,
Milê yê mayîn cî derdixîne.

Gele tiştê dijminatiyê pêşda tîne,-
Borcê giran dane ser pîredaykê,
"Sîbend şîretke, derxe ji wê delkê,
Wekî ew zara neçerçirîne,
Û wan nexe, wan negirîne."

Pîrê diçe nava malê
Sîyabend ra dike wê hewalê:
"Sîyabend, lao, sihet û qeweta min,
Tu ûrta min û qanatê min,
Tu çira milê zara dişkênî,
Wana dixî, dila xwe dihêlî,
Çî te wan ketîye, ewana çi te kirîye,

Çi zirar dane te,
Na axir ewana hevalê tene,
Tera dilîzin, ew gunene“.

Sîyabend:— Na, na, dayê, ew zarêd xirab
Tûcara nikarin min ra bibine heval.
Dayê, ewana te ra rast negotine,
Ez dest nadime zarêd belengazane.
Rast e, min serê Qero şikênandîye,
Çimkî ewî mirîşka pîrka Zoza belengaz dizîbû.
Min milê Çaçan cî derxistîye,
Çimkî ewî Hesoyê feqîr biçûk kutaye,
Daye girîyandinê û çêr êwî kirîye.

Min cûrekî mayîn nekirîye tucar,
Çimkî ewana niheq bûn, diya mine remdar,
Min bihîşta gedê belengaz bikutana,
Payê xwe bidana û bê xem bigeryana?
Ne te ez şîret kirime, bi gilîyê xas,
Wekî ez herime pişta merîyê belengaz.

Wekî ji diza em heyfê hilînin,
Zorba-zulmkara bihincirînin,
Dayê, famdike, wekî Sîyabendê delal,
Pişta rastîyê sekinîye timcar,
Gilîya famdike, rast difikire.
Dayê duşurmîş dibe, enîya wî paç dike.
Ji wê yekê gelek sal derbas bûn,
Sîyabend ro-bi-ro mezin dibû.
Bû xortekî fêrizî û rindî egîdî,
Bi xîret, ser xwe û heval-hizkirî,
Bi dil saxlem û xweyê dilsaxîyê,
Lê tu kesîra neçû alçaxîyê.

Cahila timê peyê Sîyabend didan,
Ew kivş dikirin serkarê xwe.

Gazî Sîyabend dikirin, wekî bike alî wan,
Pez-dewarê dizî ew para bîne,
Diza, miftexura bihincirîne
şivan û gavana bêy Sîyabendê Silîvî
Tucar nanê xwe nedikirine nîvî.
Sîyabend jî bilind digirt qedirê wan,
Timê mîna şêra sekinîbû pişta wan,
Sîyabend hercar, heta berbanga sibê,
Kêleka kal û pîra çîrok dibihê,
Hînî gilî û gotina dibû,
Beyît û kilam hîn dibû.
Yan jî rojêd telî,
Ser serê wan ra giran bihurî.

şivanê kal:— Eman derdo, derdo, derdo
Derda daye li ser derda,
Emê heta êvarê ketine
Tefakûrîya van zarêd xwe da.

Eman derdo, derdo, derdo,
Derda daye li ser derda,
Bira agir bikeve mala
Van bêşerm û kedxura.

Vî erdî, vî ezmanî,
Vî derdê bê dermanî,
Bilbilê malşewitî.
Ser belgêd darê dikir gazî.

Eman derdo, derdo, derdo,
Derda daye li ser derda.

Kerî derketine ji zozana,
Xwe dane palêd van çîmena,
Ketine nav gul û sosina
Tê kalîna berxa û berana.

Tê kalîna berxa û berana.

Eman derdo, derdo, derdo,
Derda daye li ser derda.
Çîya bilinde rê li bera,
Kesek tune van dera,
Me xilaske ji kedxwura,
Azayê bîne ji me ra.

Eman derdo, derdo, derdo,
Derda daye li ser derda.

Derdo tu nolî bûka salê,
Nolî kevoka berî palê,
Dil û hinavêd min birîndarin
Destî van derd û kula.

Eman derdo, derdo, derdo,
Derda daye li ser derda.

Rokê şivanekî derheqa Ehmed da
Gilî dikir û xeber dida
Sîyabend ew xeberdan rokê bihîst,
Wekî nêzîkî hidûdêd welatê ereba,
Germî-germistanî, dijî cimaeta li wî alî,
Hemûşka dida navê Ehmedê dewletî-
Xweyê kerîyêd mîya û refêd hespa,
Boşê devê wî diçêrin besta.

Sîyabend wê rojê dereng vegerîya,
Rêva duşurmîş dibû, derheqa gilya,
Derheqa Ehmed da û wê xîretê,
Xweyê gele hebûn û dewlet sîyanetê.
Wextê gihîşte malê, bala xwe dayê,
Serê dayê berda, bi destê terikî
Dixebitî, dan dukuta û diçerçirî,

Dilê Sîyabend şewitî, ew vir kewgirî,
Çîkê agir dilê wî firî,
Çav tijî hêsir bû, hiş nestirî,
Çawa kizirka ser sêla agirî.

Ewî zef ji pîredayka xwe hezdikir,
Êdî nikarbû xwe zeftkira, ew hemezkir,
Bi dilê xwey kurîn, bi dilê xwey kemal,
Û gote diya xwe bi evîntiya delal:
— Dayê, êdî ez mezinim, fam dikim,
Mira şerm û eyba heta mirinêye,

Wekî tu ber vî derî û wî derî,
Bi porê xwey sipî xelqê ra bixebitî,
Qote nan tînî û min xwey dikî.
Wekî tu destûra min diha bidî,
Ezê herme xebatê li bal Ehmedê dewletî,
Ezê jê ra bikim rênçbertîyê.
Emê xilasbin ji halê parsekçîtîyê.

Wê derê pakin ji rênçbera ra,
Hêqê baş û gûçlî didine rênçbera,
Ezê bixebitim, çiqas qeweta min heye,
Ew emekê te li min kirye,
Ez wî tucara li erdê naxim,
Temî û şîretê teye rast, bîr nakim,
Nola ronaya çavê xwe biqedînim,
Çaxê ku ez hinek hebûn dest bînim,
Binelîtîyê li wê derê îzbat bikim,
Ezê bême pey diya xwe ya kemal,
Bi şabûn wê bibime mal,
Dayê, çi dibêjî, ez herim, yanê na?..
Yan ser me da bê şipûka kula,
Qet tu nabihêy axîna dila.

Pîrê ber gotinê wî teamûl neda,

Kire axîn û kûrîn ketê, girya,
Zanibû, wekî emekê wê neçû deîya,
Sîyabendê wê bûbû yekî usa,
Çawa ku ewê duxwast dîsa.

Dayê hemêz kir kurê xwey ezîz,
Da ber dilê xwe, ew paçkir,
Ricifî ancax xwe zeftkir,
Îzna Sîyabend da, dua-oxira wî kir.

"Here, ewledê min î ferizî delal,
Bira mirazê te nîvcî nemîne!
Bira qeda û bela dûrî tebê,
Bira xwedê te xweyke û rûspîke!

Here, lao can, bibhê gilîyê min,
Bibe xweyê kesîb û fiqara,
Çawa rê da, usa jî her dera,
Eve gotina daykê ji te ra.
Bîra xwe da xweyîke evan gilya:
"Berf dihele, çîya dimîne,
Çem dikşe, ber dimîne,
şêr dimire, çerm dimîne,
Mêr dimire, nav dimîne,
Dinyayê da tenê mêranî dimîne".
Here, kurê min, oxirbe te ra,
Dilê dayka pîr nolanî bera"...

Dê xebera xwe kuta kir,
Hêsirê çavê xwe temiz kir,
Wekî Sîyabend nebîne hêsira,
Ewê serê xwe bilind nedikir.

Derxist ji xurca cihêz
şe'ra xase, al-gevez,
Ku anîbûn xazgînîyê ber miraz,

Girêda bedew dora kolos.
"Bimbarekbe, ez ji vê rojê razî"!
Sîyabend çok da erdê,
Ramûsa destê dê,
Danî ser çavê xwe,
şerê dil disot,
Paşê rabû, wa got:-
"De ma xatirê te, dayka delal,
Tu neke xem û xiyal,
Ez nimz nakim kolosê delal,
Ez bîrnakim gotinê te tucar,
-"Berf dihele, çîya dimîne,
Çem dikşe, ber dimîne,
şêr dimire, çerm dimîne,
Mêr dimire, nav dimîne,
Dinyayê de mêrxasî dimîne“.

Û Sîyabendê Silîvî kete rê,
Diçû ber bi êla Ehmed axê,
Ku bidîta xebat û sitar,
Wekî ew li dinê nemînin bêçar,
Kilama xerîbîyê digot xwe ra.

"Ez rêwî me, ezî li rê me,
Tevî-tevî teyroka berfê me,
Ezê ketim cîkî xirî-xalî,
Nizanim rîya êla Ehmed maye kî yalî.

Lê-lê, weylê,
Ev çi deşt zozanin,
Gul û çîmenin.

Ezê herme welatê xerîbîyê,
Welatê xerîbîyê dilê min ra dûr e,
Ba tê, baran pê ra dilîlîne,
Bîna kulîlka ketîye gelî-gubêzan e.

Lê-lê, weylê
Ev çi dinyayêye
Em pê ra ketinê.

Dayê, ezê xerîbim ji Silîvê,
Ez wedekî derbaskim li xerîbîyê"

Diçû çîya ra û banîya ra,
Diçû gelî û gubêza ra,
Diçû deşt û zozana ra,
Diçû nava mêrg û çîmena ra,
Rêwîtî dikir cûre-cûre merî ra,
Komek dida feqîr-fiqara,
Zef cara weyset hildida ji wana,
Bi pirs û pirsîyara
Dît êla Ehmed axa,
Lema jî gotin: meriv ji pirsê
Dikare here Qursê.

Rîya xwe wî guhast, ber bi wî alî çû:
Ber bi çîyayê bilind ecele çû.
Xemilî bû bedena çîyê gul û rihana,
Dilivîn refêd bêrîvana,
Kerîyê pez û berxa, revoyê hespa,
Naxirê dêwêr û boşê deva.
Wî bi edetê kurda selam da wana,
Û ji wana pirsî bi dilê saxa:
"Ev kerîyê kê ne, gelî bira?"
şivan metel man û cab dan:

"Kerîyê pezê Ehmed axayê êlêye".
„Lê ev revoyê hespa ya kêye"?
"Ew jî revoyê hespêd axayê êlêye."
„Lê niha Ehmed axayê êlê li kuye"?

Ew ser gilîyê Sîyabenda ketin mitala,
Ewan gelekî şikberbûn gilya,
Wana nêteke dinê birine dilê xwe.
Xortekî dest da ser qevza xencerê,
Sîyabend nihêrî ji serî hetanî pê,
Paşê ketin pey me'neya pirsê:

"Lê tu kêy"? Xort kete pey hisê:
Dibe ku cesûsê wî bazirganbaşîyê merzî,
Tu hatî van dera tişta bihesî..?
Malê me derdî bi fen û dexesî.

Sîyabend.-Ez tu bazirganbaşî nasnakim vira,
Ez Sîyabendê Silîvî me, ji êla Silîva,
Ez dixwazim bibînim Ehmed axa.

şivan:— Pirsa etib tê tine be, bona çi gilî
Tu dixwazî Ehmed axa bibînî?

Sîyabend:— De çi gilî hebe, hûnê paşê bizanibin,
Tenê hûn konê wî nîşanî min bidin.
Lê pismam, destê xwe ser xencere hilde,
Meriv usa berbirî mêvana nabe,
Tucar tu şikbirî min nebe,
Bi wê yekê tu min natirsînî
Ez ne yê tirsê me, tirs min direve,
Pak ew e, em pismamtîyê hevra bikin!
Kul-derdêd kesîba qet ne hindikin,
Tenê emê sibê kêrî hevdu bên...

Wexta ev pirsana şivanê kal bihîst,
Demarê wî tev pêda lîst,
-Em herin, lao, wî gote Sîyabend,,
Ez dinihêrim tuyî mêrê merd...

Mala Ehmed axa da mêvan rûniştibûn,
Ew jî giregirê êlêye dewletî bûn,
Ewana cap dane Ehmedê axayê bilind,
Wekî mêrekî xerîb hatîye êla mezin,
Dixwaze te bibîne. Nizanim çima.
Got-wî bînine. hundurê konê me.
Sîyabend vir birine alîyê dîwanê.
Sîyabend selam da û temene bû ber axê,
Axa otaxê da rûniştîbû ser xalî-xalîça,
Tijî belgî bûn ber pala wî da.
Rîdan dirêj, pêça sipî li serî,
Dorê rûniştîbûn sê-çar elbaşî,
Tizbî dikişandin, ketibûn şêwrê,
Dest wan da bû bextê wê dewrê.
Bi çavê qelp Sîyabend dinêrî,
Bi fenî pirskir ji wî:

Ehmed axa:— Çawa dixwiyê tu ne van deranî,
Tu merikî xerîb hakimê mêranî,
Bêje, kurê min, gotina te çîye,
Bi çi xizmetê te derê min vekirîye?
Hema wî wextî axakî serkeçel,
Zik qalim, bi çav teyrê decal,
Sîyabend nihêrî bi fenagurî,
Paşê ber bi Ehmed zivirî.

Axa:— Lo Ehmed axa, pismam, malava,
Çi lazim e merî bêwext bê bal we,
Her rewîkî, parsekçî mirdar,
Bê odê, nolî gurê har,
Ku odê da kêfa camêra xirabke,
Ber me bikene, xwe nava gilîarake,
Te emir bide kerîk nan bidin koçera
Û berê wî bidin rê û dirba,
Lê ne ku ew bên dîwana axa...

Ehmed axa: Na xêr, usa pak nîne, lêzim,
Kê ber bi min tê, lê dibim lazim,
Mêvanê min merikî hêjaye, sîyanet,
Cem wana tune delka mixenet,
Pak nîne meriyê xerîb meriv bê hurmetke,
Carekê va ew yek camêra ra dest nade.
Derê min vekirîye, sivra min raxistîye,
Hertim bona rêwîya dilê min vekirîye,
Dibe şuxulekî wî heye, dilda kul û derd e,
Yan jî hatîye şêwrekê ji min hilde.
Ehmed axa vegerîya alîyê xort,
Xeberê wî dilê êlbaşî disot.
Sîyabend, ku sekinîbû cîda, nedilipitî,
Ewî pirskir jê bi zarekî şîrîn,
Çawa bav pirs dike ji ewledê hizkirî:

Ehmed axa: Bêje, kurê min, çima hatî welatê me,
Xwestin û xizmeta te çiye vira cem me?

Sîyabend ber xwe diket boy pirsê giran,
Ya wî axayê rûniştî cem wan,
Ji zarê êlbaşîyê ew hat ser hemdê xwe,
Sîyabend temane bû û gote axê wira:

"Saxîya te dixwazim, axayê min î delal,
Welatê me da derheqa te dibêjin gilîyê zelal!
Zef peyîyê te didin merîyê rîspî,
Çawa merîkî rem, cem te tune qelpî,
Me zef sekiriye, lê hindik dîtîye.
Pişt çîya û baniya ji cîkî dûr hatime,
Ez tayê tenê me, xortekî serê xwe me,
Kesekî min tine, xênî dayka ezîz,
Dilê wêy rem û dilê temiz.
Min qirar kir, wekî ez bême êla te,
Xebatekê bibînim, binelîtîyê vira îzbatkim,

Çi ku min sekirîye, bi çavê xwe bibînim".

Ehmed axa:— Navê xwe bibexşîne, xortê delal:

Sîyabend:— Navê min Sîyabendê Silîvîyê, ez xulam.
Xeberdana Sîyabend lê timê şîrîn,
Ew bejina bilind û lêvêd narîn,
Ew dêmê kubar, nûr lê dibarin.
Hemûşk metel mabûn wê şerazetîyê,
Û dest-pê wî mêrê qurbetîyê.

Ehmed axa fikirî û lê xweşbû beşer,
Wekî rastî wî hat ew xortê neder.
Wî begemîya xwe da Sîyabendê Silîvî,
Ew kifşkir seysê revoyê hespê erebî.

Wextek derbas bû, Sîyabend nasîya xwe da
Merîya û nava şuxulê xwe da qanix bû diha.
Ûsa jî merîya ew diha naskirin,
Û dilê xwe Sîyabend ra vekirin.
Ehmed axa ew cerband, ku çi merîye,
Çawa dixebite, heywan çi cûreyî xweydike,
Bi çi çavî milkê wî û hebûnê dinêre.

Berbiçav bû xebata Sîyabend nav hemya,
Hemya begem dikir dilsaxiya aza,
Û nava wan da, çawa şereza,
Ew kivşkir serekbaşîyê seyîsê hespa.
Hê sala Sîyabend temam nebûbû,
Hela gelek gilya ew nehesîyabû,
Rojekê dît, wekî merî top bûne,
Wê tên-diçin, her aliya dibezin,
Dikirne piste-pist bi tirseke mezin.
Dilê hemîya da tirs, çavê hemîya da xof,
Kalemêr dibên „ax" ... Jinê pîr dibên „of"...
Te digot ser wan da tê bayê tofana sert,

Yan jî birûsk ji ezmana wan ra tîne derd
Sîyabend nêzîkî wan bû û dixwest bizanbiya,
Ew çi piste-piste û menya gilîya,
Lê ew mêr vira bûn, zû dizivirîn,
Tiştekî dinê digotin û dengê xwe dibrîn.

Sîyabend bi wê yekê hat ser wê nêtê.
Wekî ji wî vedişêrin wî tiştê netê.
Ewî zanibû, wekî tiştekî nepak qewmîye,
Cimaet ji wî feqî dike, wê qewmandinê
Hiş-aqil ji serê Sîyabend firî,
Hindik ma, ku ew kerba bigirî.
Zef ber xwe diket, wekî cimaet
Wî gilî ber wî nakin misilet.
Çawa ber merîkî xerîb û dereke,
Ewana sura xwe wî aşkere nakin.

Bi guman ew çû çiyê, nava şivana,
Gazî wana kir û pirsî ji wana:
-Gelî bira, çi qewmîye, çira hûn bêkêfin,
Çira hûn qefilîne, werin bêjne min,
Çi qewmîye, ji min vira vedişêrin?
Wexta ez nêzikî we dibim, hûn newêrin
Wan gilya ber min safî bikin,
Ne ez hevalê we me, şerm nîne we ra,
Ku ji min gilyê xwe vedişêrin?

şivanê kalî dinêdîtî ji roja pêşin da
Sîyabend zef begemkiribû, nolî kurê xwe,
Û axîneke kûr rahişt, nêzîk bû
Û destpêkir bi melûlî şirovekir...

— Sîyabend, delalê min, hela tu cahilî,
Te umir netîye, nizanî hûrgilî,
Çi qewmîye, evî welatê me yê şîrîn,
Dujmin lê bîterbûne, ser me da tînin şîn.

Nahêlin qet tiştek lê bijî, bîterbe.
Nahêlin tişt bin rema xwe da zêdebe,
Ne heywan, ne teyrede, ne merî,
Wekî bi xebata xweye helal bijî.

Teyr kewê digire û dipertîne,
Piling-xezalê, gur pêz direvîne,
Lê zorbe jî— feqîr û fiqara.
Zor û zulmê gelekî tînin kesîba ra.

Gelek sal berî hingê mîrê ereba,
Êrişî ser me kir, nolanî seba.
Serbiharê nolî refê elka,
Wana ji me dibir keryê mî û berxa,

Zar dukuştin, dibirin qîz û bûk,
Û em destê wan da lap bûne pepûk.
Niha jî wî kifşkirîye herafbaşî,
Yê ku ser me da tîne nexweşî,

Boy miletê me ew bûye dujminê xûnxwar,
Erdê me da her ciya kuştin û her ciya zare-zar,.
Ew herafbaşî, nolî teyrê decal,
Me vir pûrt dike, xwe ra dibe mal.

Her sal, her car, me bêhurmet dike,
Timê çok dide ser ruhê me,
Zeftkara dişîne, xerc dixwaze,
Ceh û genim, rûn û penîr,
Hespa û pez, zêr û zîv.
Yê şuxulê xwe da mijûle,
Xwestina wî derengî dixe,
Tê destê zorê dikute û qirdike,
Kal û pîra, zarê tifal napirse,
Mala me xirabdike, wara nahêle ser war,

Çi ku heye û tuneye, dibe, me dihêle bê par.
Kê dikare pêşberî wî derê,
Yê ku xeberde, zimanê wî jêdike.
Cimaeta me qifilîye tirsa sawa,
Nikare serê xwe bilindke tucara.
Nizanim kî derê xebereke nebxêrîyê,
Gihîşte me da, du li vê derê
Herafbaşî derbasbûye hidûdê,
Mîna de'bê çolê hicûm dike û tê,
Bazirganê wî sekinîye ser kaniya Nezirwanê.
Wexta Sîyabend ew bihîst, wê derê
Bîr anî pirsê delala pîredê,

"Komekê bide feqîr-fiqarê êlê.
şêr dimire, çerm dimîne,
Mêr dimire, nav dimîne,
Dinyayê da mêranî dimîne".

Sîyabend diha qet nesekinî,
Hespekê siyar bû, ling kire zengûyê,
Qilbû ber bi êla mezine xweguman,
Gihîşte konê Ehmed axa.
Giregirê gund rûniştibûn kon da.

Sîyabend ji hespê banzda erdê,
Tewaqekir, çû aliyê dîwanê,
Axa ew yek zanibû zû da,
Sîyabend dinihêrî pêra-pêra.

Ehmed axa:— Îro çi qewmîye xortê delal,
Kê tu bêhurmet kirî, ku hatî mal?
Çima hêrsa te rabûye, kurê min,
Dibe te xweş nayê qeyîdê êla min?..

Sîyabend bala xwe da êlbaşîyê kal,
Temene bû li ber, bi hurmetî çû bal,

Ji çava pirîskê agir difiriya,
Û gotê,— bibexşîne, Ehmed axa,
Bi îzna te ez hatime vira,
Zexmetê didime dîwan hana,
Min ji çiyê û ji xorta bihîst hêja,
Dujminê êla te hatye vandera.
Herafbaşîyê nemerd û qetildar,
Hicûm kirye ser welatê me yê dîndar,
Li ser kanîya Nezirwanê danîye,
Wê xwûnê birêje, talan bibe.

Ji destî zulmiya wî cimaet qefilîye cîda,
Dest ber xwe hilnade ji destî sawa,
Dengê destgirtîya û jin û qîza
Hingavtin evder, digihîje ezmana.

Niha ez bona vê yekê hatime ecele,
Qezya ku hat, tune mecale.
Ez dixwazim bêjim axa yê delal,
Te ra bêjim fikira xweye zelal.

Ehmed axa, bi dilekî kul,
Mirûzkirî bi dengekî zelûl,
Zû pirskir ji Sîyabendê delal:

-Bêje, kurê min, fikira te çîye?
Eva du roje em rûniştine vira,
Fikir dikin nabînin tu riya,
Ku azabin ji xwûnrêtina,
Em rêkê û dirbekê nabînin xwe ra,
Ev çi zulme, em ketine nav da,
Binkin bazirgan, çawa sebebê gilya.
Bêje, lao, Sîyabend, gotina te çiye?

Sîyabend:— Cî û rifaqetê bide min her dera,
Ji tewlexanê hespekê xwe ra

Hildim, rima du movkî ji nava rima,
Ezê herime pêşîya herafbaşî,
Min minet tine qet wî dujminî,
Ezê temîyê dîya xwe bînime sêrî,
Ezê ji te ra bînim serê herafbaşî.

Kesek min nasnake nava êla te da,
Ez bême kuştin, nabe keser dilda.
Ez xerîbim, dûrim, lê ne ji van dera,
Kuştin dinê heye tenê bona mêra,

Wê min bizanbin, ez vira nenasim,
Dibe ev qurbetî min ra bibe pesin.
Ehmed axa qasekê fikirî xwe ra,
Serê xwe berjêrkir kete mitala.

Serê xwe bilind kir, Sîyabend nihêrî,
Çavêd wîye reş agir jê dibarî.
Bejna wîye bilind çînarî,
Namila wîye pe'ne mertalî,

Famkir, wekî zulam way egîtî
Wê bi namûsî bike mêranî!
Na, na, ew tucara unda nabe vî warî.
Ew hêdî-hêdî ji cîyê xwe rabû,

Bi delkî nêzikî Sîyabend bû,
Destê xwe danî ser milê wî ber
Bi qelpî jê ra got ev xeber:
— Here, ewledê min, bira te ra oxirbe!
Ji tewlê hilde hespê min,
Rima qesaye destê min,

Bira te xweş helalbe, kurê min!
Here, kurê min, ew te bimbarekbe,
şîrê bedena dîya te te helalbe,

Bira xwedê tevî oxira teye rastbe.

Ehmed axa heyîf danî
Hespê şê, rima qesayî
Wan bide wî xulamî,
Ew ne hêjayî wî qîmetî.

Lê ditirsîya ji herafbaşî
Ewê xwûnxwur wê bi zortî
Bistîne rima qesaye destê wî
Wî bukuje û bibe hespê şêyî erebî

Qirar kir vî teherî:
Sîyabend bi çek-sîleh bişîne
Pêşiya dujminê xwey e'seye,
Wekî Sîyabend bê kuştin, ne kedere,
Wekî ew herafbaşî binke,
Ezê xilasbim ji agire.

Sîyabend ber Ehmed axa dawestiya,
Serê xwe nimz kir, destê wî ramûsa.
Çû tewlê hespê şê tîmar kir,
Çavê wî ramûsa, dêl û bijî şekir,
Zînê zerî mêrdînî li piştê kir,
Teng û berê hespê şê qewînkir,
Derxiste sivderê, gemkir.
Lingê xwe kire zengûya zêrîn,
Da orta xwe û zînê zerî mêrdînî,
Rima qesaye çarde movikî.
Xatirê xwe xast bi şîrinî,
Ji cimaeta topkirî xatir xast,
Hespê şê zengû kir bi eşîrî.
Ewî kire hîrîn nola teyra firî
Ji bin sime wî pirîsk diçirûsî.

Toz erdê babelîskî bilindbû,

Ji merya tirê ew bagera xwelîyêbû.
Nola babelîskê dûrva wunda bû,
Ji çîya û banîya derbasbû,
Êdî gelekî ji cimaeta êlê dûrbû
Çend jinê sere giryan, kirine axîn,
Heyfa xwe gele li Sîyabend anîn.
Qîzika keser kişand, dilê wan bû çirkîn
Kilama maşoqîyê avîtine ser û girîn,
Û koma qîza bin bindarûka
Kilameke zelûl wa stiran:-

"Ro dertê ji hindava,
Bira xwedê xirab bike mala sebeba,
Wê çawa ocaxê me dane ber xunava.
Sîyabendê Silîvî diçe pêşîya cerdbaşî,
Tevê zeriqandiye zîn, gustîlk û qaşî,
Bira xwedê mala mîrê ereba xirabbike,
Sîyabend xerîbe, dil me dimaşî.

Nizam çima teva îro hêdî dertê,
Sîyabendê Silîvî berê xwe daye vê qurbetê,
Bira xirabbe mala mîrê ereba,
Me nizanbû gêyma heraf bejna wî tê.
Sîyabendo, dilê min merûme kul û derd e,
Hespê te qubeye, qamçîya lê mede,
Wekî herafê meydanê derbek tekeve,
Ez merûm nizanim kê bê birîna te girêde"

Sîyabend gihîşte kanîya Nezirwanê,
Dizgîna hespê şê kişand, da seknandine,
Ji hespê peya bû, çok da ser kanîyê,
Ava kanîya Nezirwanêye sar vexwar,
Ava kanîya sar dil û hinavê wî hênik kir.
Destê xwe da ber enîya xwe, mecalê çêkir,
Çar alîyê xwe nihêrî, tebî raçav kir.
Cîyê hêwrandina bazirgan ewî nihêrî,

Herafbaşî, hazirbû didît, wî çaxî,
Dixwast merîya bişîne Ehmed axa bibîne,
Xerc-xeracê zûtirê jê bistîne.

Herfvanek zû bezya hundur,
Melûmetî herafbaşî kir,
Wekî sîyarekî tenê sekinîye,
Ejdehare, li ser kanîya Nezirwanê,
Destê xwe danîye li ser enîyê,
Dora xwe dinhêre, nola mêrê mewtê,
Qeyî dibê me digere li vê derê.

Herafbaşî ew cab sekir,
Ma ecebmayî û saw-xuf kir
Bi xof çadira xweye reş derket,
Bi çavê xwe li ser kanîyê sîyar dît,
Dewsgirtîyê xwe dinhêrî, jê ra got:-

"Yê ku nav dengê me sekirîye,
Heta roja îro turuş nekirîye,
Ser rê û dirbê bin bisekine.
Here binêre ew çi meriye,
Li ser kanîyê usa bêtirs sekînîye!
Dibe wekîlê Ehmed axaye,
Xerc û xeracê êlê zû-zû me ra anîye,
Yan jî rêwîke, ew îro xalifîye,
Derbeke giran nav çava xîne
Hespê şê jê bistîne, zû min ra bîne,
Hergê xeberde, poz û kepîyê wî jêke,
Dîl bigire, derdê giran lêke,
Erdê ra kaşke, ji mira bîne".

Komekdarê wî pêra-pêra temene da,
Ber begê xwe peyê xwe da,
Hesp kişand, teng û ber şidand,
Li hespê sîyar bû, beyîteke quranê xwend,

Ajot ber bi kanîya Nezirwanê çû
Gihîşte cîyê seknandina Sîyabend,
Pêşberî Sîyabend qure û kubar sekinî.

-Hê, tu kîy, çi şuxulê te heye vandera,
Li van cî û meskenê şêra?..
Tu ji êla Ehmed hatî vira,
Te xerc û xerac çima naniye mera?
Yanê te navê herafbaşî senekirîye,
Wekî li ser kanîya Nezirwanêye,
Nava çayr û çîman, gul û sosina,
îzina tu kesî tune bisekine.
Teyîr ku teyîrtîya xwe difire,
Em diçin wî hewa digirin,
Per û baska li wî dibirin,
Û paşê em wî berdidin.
Ezê niha guhê te vir bibirim,
Ji herafbaşî ra bibim,
Hespê şê û rima qesay ji te bistînim
Jêra çawa ku pêşkeş bibim.
Lê bal kaniya Nezirwanê îzin tune,
Wa bêxebat û bêtebat merî bisekine.

Sîyabend:— Hêy sîyaro, ez Sîyabendê Silîvî me,
Tu bixwe, paşê bişekirîne!
Min xerc û xeracê Ehmed axa anîye,
Wekî bidime herafbaşîyê we.
Lê Ehmed axa xerc hindik şandîye,
Dewsa xerc min boy we anî rima qesaye.
Sîyabend wê deqê hespê şê zengû dike,
Sîyar nize dike, ji hespê jorda tîne
Diranê wî ji pudya dikişîne,
Poz û kepîyê wî jêdikîne,
Diran netika wî da dukutine,
Poz-kepîya dike cêva wîye,
Para ser herafbaşî da vedigerîne.

Û paşê dibêje wî mêrikî:

-Min cara ewlin hûn sax hîştin,
Here û elamî wî ke, kê tu şandî,
Bira xwexwa bê ser kanya Nezirwanî,
Nîvê xercê mayîn bistîne bi qewl û nîşanî.

Komekdar nav xwîna licimî da,
Dest Sîyabend da tengezarbû
Ancaxî li hespê sîyar bû,
Hesp ajot nêzikî çadirê bû.
Çaxê herafbaşî dewsgirtîyê xwe dibîne,
Dil dilerize, ji çava hêsir dibare,
Hela tu kesî ew bêhurmet nekirbû li dinê,
Ewê çawa saxke wê kul û birînê.

Wê demê dûrva dengê kilama,
Sîyabende mêranî dihate wana,

"Ez heme Sîyabendê dîn im,
Tîmarê li hespê şê dixînim,
Lê dikim zînê zerî mêrdînîye,
Didime orta xwe û zînê zerî mêrdînîye,
Rima çarde movikîyê qesaye,
Boy xatirê vê kanîyêye".

Herafbaşî nav emrê xwe da
Hela tu cara nedîtîbû eceba usa,
Wekî heye merîkî wa bi ser xwe,
Bûy ji dîya xwe ra, riya wî bigire pêra .
Poz û guhêd komekdarê wî jêke,
Wî bênamûske, paşda verêke.
Ûsa jî bi kilama, gefa li min duxwe,
Dibêjî qey mêra nabîne ber xwe.

"Ez heme, Sîyabend im, Sîyabendê dîn im,

Teng û berê hespê şê dişidînim,
Ezê hezar mêrê herafa bikujim,
Serê herafbaşî axê ra pêşkêş bînim".

Herafbaşî dîn bû, hêrsa wî rabû
Çek hilda, li hespê siyar bû,
Ber bi Sîyabend ajot har û sipîçolkî bûbû.

Sîyabend jî hespê şê tîmar kir,
Zînê zerî mêrdînî ser piştê kir,
Lingê xwe zengûyîyê rikêbikir,
şerê giran wê bestê destpêkir,

Sîyabend sê denga serekbaşîyê herafê,
Bi dengê mêranî dike gazî û dibê:
-Lolo-lolo, herafbaşîyo,
Lao, tu çawa hatî ser vê kanîyê,
Ev kanî li vira ne bêxweye.

Ez heme Sîyabendê dîn im,
Tîmarê li hespê şê dixînim,
Lê dikim zînê zerî merdînîyê,
Rima çarde movike qesaye,
Didime orta xwe û zîne,
Ezê serekbaşîyê herafê bikujim,
Boy xatirê kesîb-fiqarane,

Vira pêşda hat şerekî giran,
Pirîske rima dipekîya ezman,
Te digot hevdu ketin du çîya
Bin wana da erd dihejiya,
Hîrîna hespa dikete rasta,
Qûjîna mêra dikete besta,
Herafbaşî xwest pê niza rimê
Sîyabend ji zîn bixe-bavêje erdê,
Lê Sîyabend wê demê rima xwe da rê,

Û pê qema giran serê wî pekand,
Cerd hidûda kurda raqetand.

Here Sîyabendê şengînê altdarîyê
Bi rûspîtî dest tîne,
Serê herafbaşî dipekîne,
Ehmed axa ra pêşkêş tîne,
Ay liminê, ay liminê siyaro.

Cab gihîşte Ehmed axayê êlê,
Wekî Sîyabend herafbaşî da binkirinê,
Serê herafbaşî pekandîye,
Ji Ehmed axa ra pêşkêş anîye.

Qîzkêd cahil kilama digotin,
Xorta cirîd dikirin û dilîstin
Temamîya cimaeta êlê bi def-zurne,
Bi eşq û şaya altdarîyê kifşdikirin
Meydan, govend girtin reqisîn:
-Ha gula mîra, ha gula mîra,
Sûretê sor dewsa tîra,
Ha gula reza, can gula reza,
Sûretê sor da ber geza.

Ha gula we me, can gula we me,
Genimê sorî bijare me,
Ha li ber kujê têra we me,
Min nekuje, ez gune me,
Ez berdêliya mala te me,
Kefîl deman, ez ya te me.
Ha gula axa, can gula axa,
Sûretê sor da ber daxa.

Ha gula mîra, ha gula mîra
Pevketine mîna yara.
Ha gula we me, can gula we me,

Qewil, qirar ez ya te me.

Ha gula yeman, can gula yeman,
Hal me çûne sal û zeman.
Kalê me çûn, pîrê we man,
Ha gula we me, can gula we me.
Me xwe da ber derê aş,
Mêrkê te mir, canê min xweş
Ha gula aşa, can gula aşa
Sûretê sor, çawa dimaşya.

Xorta, qîza, cahila, zara dikire gazî:
"Sîyabend em azakirin ji herafbaşî,
Em xilas kirin ji xerc û xeracê zulmkar.
Egîtê me serê dujmin jêkir anî vir.

De lolo, lolo, Sîyabendo qurba,
Kanîya Nezirwanê wê bi dûze,
Avakanîyê sar e, nolî bûz e,
Sîyabend dilê me da gele ezîz e.

Sîyabendê me sîyarê hespê şêye,
Îsal pê ra bûye mêrxasê êlêye,
Serê herafbaşî jêkirîye, axê ra anîye,
Wê cimaeta êlê xilaskirîye ji dujminaye.

Kanîya Nezirwanê bi şîlan e,
Sîyabendê egît, mêrxasê eyan e,
Serê herafbaşî jêkirîye anîye viraye,
Cimaeta ra bûye bav û biraye.

Kanîya Nezirwanê wê bi çîl e,
Sîyabend cerda herafbaşî girtîyê dîl e,
Wê em xilaskirine ji halê qûltîyêye,
Sîyabendo, bira tu saxbî li dinêye!

De, mêrxaso, naziko, tu delalê me hemîyano.
Girî û şîna cimaeta êla Ehmed axa,
Bû eşq û şayî, bû roja altkirinê",
Ew bû egît, delalî û pizmamê wan,
Çiqa merya kêfdikir, ber bi Sîyabend diçûn,
Ehmed axa, êlbaşîyê êlê, xwexwa çû,
Peşya Sîyabend, ew hemezkir û paçkir.

Sîyabend pêra-pêra ji hespê peya bû,
Silav da cimaetê û temene bû.
Serê herafbaşî jorda anî,
Ber Ehmed axa û cimaeta êlê danî.
Ehmed axa dîsa Sîyabend hemezkir,
Emirkir, wekî textê kêfê hazirkin,
Berxa, mîya, canega, nogina serjêkin,
Dewetê teşkîlkin, kêfê hazirkin,
Bona hurmeta Sîyabendê altdar û mêrxas.

Ehmed axa textê mezin rastkir,
Berx, mîy, canege, nogin serjêkir.
Wextê eşq û kêfêy giran gerîyan çawa bira,
Eşqa altdar vexwarin, kêfkirin forma bira,
E'ba mezin nav milê Sîyabend werkir.

Çapa şabûna cimaeta êlê tinebû,
Bona mêrxasê wan, bona egîtê wan.
Ji wê rojê şûnda Sîyabend bû egîtê wan,
Ehmed axa bêy Sîyabend nedima,
Serê dîwanê Sîyabend, binê dîwanê Sîyabend.

Wê rojê da tu cara gilîyêd ferz
Ewî bêy Sîyabend nedikir lez,
Wê rojê da bona qedandina hemû gilîya,
Ji Sîyabend dişêwirî û dipirsîya.

Kulfet navê Sîyabend danî,
"Piling, mêrxasê evîn“,
Bi navê Sîyabend sond dixwarin,
Timê navê wî dihate wekilandin,
Usa cimaeta êla Ehmed axa
Bi qedir û kubarî hildidan,
Navê mêrxasê xwe, egîtê êla xwe.

Sal derbas bûn bi xêrî û şayî,
Biharek ji wê roja kurda azadî,
Derbas bû, dûrket, xatir ji êlê xwest,
Û kete zivira emirê xwey rast.
Dîya Sîyabende emekdar vir kete bîrê
Ew fikir kir, kete tefekûrîyê.
Lê ji dilê wî nazikî kurînîyê,
Dernediket huba şîrîntîya dê,
Bi navê wê timê diçû cerdê.
Rojekê çû cem Ehmed axê êlê,
Tewaqe kir, rêdan xwest derheqa dê,
Wekî here wê xilaske ji belengazîyê.

-Ehmed axa, ez bêhesab razî me
Ji nan û xwêya te, qedir-qîmetê te!
Lê eva du sale ez ji dîya xwe dûr ketime,
Ewa du sale ez haj pê tune me,
Nizanim çawane, halê wê çiye,
Nizanim ew sax e, yanê miriye,
Wekî çavê wê rê nemîne,
Îznê bide herim dîya xwe bibînim,
Tu îznê bide, wekî hildim bînim.

Wî ev gilîyê Sîyabend sekir,
Dilê wî tijî bû, serê xwe berjêrkir
Hevsûdî kir, wekî lê tune
Kurekî mêrxas û egît,
Ûsayî bi sirafet û şîr helal,

Nolî Sîyabend bejin-bilind û delal.
Ewî Sîyabend bi qelpî hemêzkir
Û bi dilekî nezelal got:

-Here, te ra oxirbe, ewledê min,
Tu çiqas mêrxasî û bêtirs î,
Hewqasî jî tu dilxas î,
Hewqasî bi rem î û şîrhelal î,
Hewqasî boy me tuyî kemal î
Hergê duxwezî dîya xwe bibînî,
Ez nikarim îzna te nedim.
Here, riya te vekirîye, ewledê min,
Tu hêjayî hemû qedir û qîmetî.
Here, hespê min î şê pêşkeşî te,
şûrê min, rima min pêşkeşî te,
Here, bi îzna xwedê tuyî dîya xwe
Silamet bibînî, kêfa wê bipirsî,
Bi xêr û silamet, dil eşq vegerî.
Pîre dayka xwe tu xwe ra bînî
Derê min şev û ro wêra vekirî,
Ewledê min, tu gele egle nebî,
Zû vegere were, min ra tu mizgînî.

Paşî vê gotinê Ehmedê êlbaşî
Bi hezar tule nanê lewaşî,
Xurca Sîyabend tijî kir û girêda,
Enîya wî paçkir, verêkir rêda.

Here, Sîyabendê min î şengîne,
Tîmarekê li hespê şê dixîne,
Lê dike zînê zerî mêrdînîye,
Teng û berê hespê dişdîne,
Lingê xwe dike zengûyîye,
Dide orta xwe û zînê mêrdînîye,
Rima qesaye donzdeh movikîye,
Ber bi pîredaykê ajotîye çûye,

Ay sîyaro, delalo, mêrxaso sîyaro.

## PAR II

Sîyabend hespê şê sîyar kete rê,
Çîya ra çû, gelîya ra derbas dibû,
Gele çemêd kûr û kendal derbas bû.
Nava gele deşt û zozana ra derbasbû,
Gele çol-çolistan û qir-qirstan derbas bû.
Gelek çû, hindik çû, dora wî heralî,
Cîkî qirî-qirstan û xikî-xalî,
Konekî tek û tenê dûrva qişirand,
Çaxê Sîyabend xwe pêra gîhand,
Derê kon vebû, jê qîzek derket,
Qîz nîbû, husulcemal bû, horî-perî!
Pencê tevê ji nederê dibarî.
Çaxê Sîyabend keçik dît, şabûna bû lal,
Ji dest gulyê dirêj û dêmê zelal,
Ji diranê sedef û lêvê narîn,
Husulcemala horiya dibarî.

Nola gula sor sûrtê wê gevez,
Dibûne xemilê, wê dunyaya terez,
Haqas cî welat koçik û sera
Wî nedîtibû hela tu dera.
Bejina wê nola çîyayê Sîpanê geş
Birû-bijangê wê nola qeytanê reş,
Devê wê biçûk, gerdene qerqaş.
Lêvêd wê zirav, nola belgê kaxezê,
Çavê wê reş, nolî ava nav tasê
Çil gulîyê reş li ser namila wê.

Sîyabend— Selam ji te ra, qîza bedew,
Qîza nazik, nola horîya k'aw!

Bi eşq û kubarî caba wî dide.

Xecê:-Selam ji te ra, hêy xortê delal!
Ji dev dipekiya hezar dur û lal.

Sîyabend:-Hêy, qîza qenc, ezî pêwî me,
Avekê bide min, ezî zef tî me.
Û heger cîyê te hebe,
Ezê vira hinekî rihetbim.
Ser pişta kihêl, eva sê roje,
Ez dajom, dunîya min bû doje.

Xecê:- Mêvan mêvanê xwedêye, xortê rêwî,
Keremke, hênikaya kon da were tu rûnî,
Hespê xwe jî berde bira biçêre,
Ew jî westîyaye, maye neçare.
Ji wî kelmê wêy şîrin û hewes,
Hindik mabû dilê Sîyabendî xas
Ji qefesa wî derê û bibe gul,
Bistirê jêra, nolanî bilbil.

Ew ji hespê xwe peya bû erdê,
Lingê hespê qeîd kir û berda çêrê.
Ewî jî ji destê wê gula rinda,
Nazike, torin, tasa avê hilda,
Av vexwar, lê tîbûna dil neşkest,
Wextê tas para da, ji keçikê pirskir:

Sîyabend:— Ay qîza nazik û îzna te heye?
Xecê:-Bêje, taweqe dikim!
Sîyabend:— Navê te çîye, gogerçîna min,
Tu çawa dara çînarê sekinî ser rîya min.
Tu tenê li vî cîyê xikî-xalî,
Qir' û qir'stan çi dikî?
Tu cahilî, xwe qezya li te neqewmîye?
Yan tu vira rastî qezîyayê hatî?

Yan tu vira rastî qezîyayê hatî?
Bêje, rast bêje, tewaqe dikim,
Soz didime te, boyî xatirê te,
Heger destê min bê, heger ez kêr bêm,
Ez ruhê xwe jî nahevşînim boy te!

Xecê:— Heft birê min, nolî gurê payîzê,
Wexta dertên meydanê, erd dilerize.
Ez bermalîya heft bira me, xortê rêwî,
Ez tenê me xûşka heft bira me, xortê qenc.
Hey kurê delal, navê min Xecazerîn e,
Qezya ku ser min da hatye, bira tu kes nebîne!
Xortê egît, gele çetin û giran e,
Tu keremke hundur qasekê rihetbe,
Tu niha kesirîn, boy xweyê malê eyîbe,
Mêvan usa li derva, cîyê xerîb nasekine.

Sîyabend:-Hey xûşka heft biraye navdar,
Hey bermaliya heft biraye kubar,
Ew çi qezîyaye li serê te qewmiye,
Ew çi nexweşiye, wekî ser weda hilşaye,
Tu ji mala bavê derxistî, anî van dera,
Van bestê xike-xalî, çolê û qira?

Xecê:-Hergî dixwazî bizanbî çi qezyaye,
Li ser min û birêd min da hilşiyaye,
Keremke kon, lezekê rihet be,
Navê xwe min ra bêje-ew ne eyîb e.

Sîyabend:— Navê min Sîyabendê Silîvîye,
Ew nav pêşkêşî te ye.
Lê ez nikarim rihet bim,
Heta ez derdê te nizanbim,
Derman destnexim û lê nekim.

Xecê:-De wekî tu xweyê xebera xwey,

Guhdarîke, ez te ra rastîyê eyankim,
Derd û kulêd xwe te ra şirovekim.
Wextekî em êla mîrê ereba nebxêrî
Hatibû mêvanîya bavê min, mal dinhêrî.

Ewî ez dîtim nava pêçekê,
Kire ser bavê min, bi hukumê delkê,
Wekî heye kurê wî negihîştî,
Wekî ez mezin bibim, jê ra bibime dergîstî.
Bavê min qayîlîya xwe da li vira,
Wekî bibime bûka mîrê ereba,
Wekî ewî bi çavekî pak me binihêrîya.
şerekî giran qewimî wê şûnda,
Orta ereb û osmanîyê da,
Bona azaya kurê mîrê ereba,
Bavê min rehmetî e'mirê xwe da.
Hivde sal derbas bû ji wê rojê da,
Paşî wê yekê her heft birêd min
Nexwestin, wekî ez bibime bûka wan,
Bibime belengaz û hêsîra wan.
Rastî bêjim, min jî tu cara
Ji kurê mîrê ereba hiznedikir.

Min tu cara nedixwest bibûma
Ber derê mîra nolanî bûma,
Û bûka sebebkarê bavê xwe.
Çaxê kurê mîrê ereba merî şandin,
Wekî min serwextkin û nîşankin,
Birêd mine ezîz ez nedame wana.
Bona wê yekê mîr gele hêrs ket,
Bi nêta xirab, wê rojê da, li pey me ket.
Wî — mîrê Ereba cerdeke giran sazkir,
Bê hed û hesab ser me da warkir,
Wekî bi destê zorê min bibin têkine bûk,
Ez mala wan da bibime pepûk.
Bona wê yekê her heft bira

Destê min girtin, ez anîm vira.
Birêd min sîyar bûn li hespa,
şer dikin peşîya mîrê ereba,
Ji hingê da şeş ro derbas bûye.

Van roja qanatê min birîye,
Ez haj wan tune me, nizanim halî çîye,
Tiştek li serê wan gelo neqewmîye.

Mîrê ereba û kurê wî niheq
Duxwastin, wekî birêd mine heq,
Nola bavê minî merûmî belengaz,
Bibine neferêd cerda wane oynbaz,
Çimkî ewana mêrxasîya birêd min zanibûn.

Hela derheqa wê yekê da Xeca zerîn
Gilîyê xwe kuta nekir, nerêt derd û kîn,
Sîyabend zû-zû mest li lingê xwevakir,
Zînê zerî mêrdinî li hespê kir,
Teng û berê wê hespê qewîn kir,
Çekêd xwe mêranîyê rind girêda
Rima donzdeh movikî ji erdê hilda,
Nêzikî Xecê bû, pirs da:-

Sîyabend:— Xeca nazik û delal, ez te recaçî me,
Bêje, birê te kîjan alî da çûne?
Kî derê ser serê wan niha ceng û qale,
Bêje, ew çîyaye, yanê newal e?

Xecê:-Ewana berê xwe dane vî çîyayê han,
Lê kîderêne, gumana min nagîje wan,
Wan derheqa cîyê şer jî min ra negotin,
Wekî ez, evdala xwedê, pey wan neçim.

Sîyabend:-De ma xatirê te, Xeca bedew.
Paşî vê gotinê Sîyabend ajote wêderê,

Kêderê şerê mîrê eraba bû,
Pêşberî her heft birêd Xecê,
Lê Xecê bi dengê eşq pey wî kire gazî:-

Xecê:-Sîyabend, bi ceger, tu kuda diçî,
Vî cîyê qirî-qirstan, germî-germstan
Axir tu min çawa tenê dihêlî...

Wextê ew deng bihîst, bû agir xwe ket,
Dil û hinavê wî şewtî, ew sekinî,
Para zivirî, Xeca zerîn nihêrî.
Xecê ji gotina xweye dilsaxî,
şermkir, soromoro bû, xûdanê serra avît,
Serê xwe berjêr kir, erdê nihêrî,
Go:-Sîyabend, axir te tiştek nexwer,
Tu rihet nebûy, tu birçî rêketî,
Hinekî bisekinîyay, heta yek dihat...

Sîyabend û Xecê nişkêva hevra kerbûn...
Li hev niherîn, ji hev femkirin...
Ker û bêdeng hev hizkirin, hev femkirin...
Paşê Sîyabend bi dengê şîrîn got-

Sîyabend:— Xeca mine bi qîmet!
Ez diçim, lê ezê zû bêm,
Lê wekî me nişkêva hev wundakir,
Tu t'u cara gumana xwe nebirî,
Kîderêbin, kîderê jî kivşbin,
Emê ese hevdu bibînin,-

Domamê, negere obe-obe,
Bira ber destê te qirarbe
Ezê paşî kewa-kubara xwe,
Navê jina bikime tobe.

Domamê, qurba, xwe baneke,

Derd û kula tev raneke,
Malxirabê kerê kezeba min hinek maye,
Bextê te me, nava xelqê da xirab neke.

Domamê, qurba, ez ji teyra teyrê reş im,
Ser çîyayê Sîpanê ra hûr dimeşim,
Wexta çavê min zerî domamê nakeve
Min tirê îsal heft sale ez nexweş im.

Domamê ez ji teyra teyrê çîl im,
Ser çîyayê Sîpanê ra dibuhurim:
Ezê dikim kewa gozel birevînîm,
Boy namûsa domama xwe newêrim.

Terezê Sîpanê ketim li vî tetî,
Domamê ser çavê min ra hatî,
Agirê kulê mala bavê ketê,
Teyê dil, cegerê min kirîye xwîna petî,
Ezê te ramûsim bi edetî.

Domamê Leyl û Mecrûm terezû ne,
Ser kavlê konê me ra bilind bûne,
Lê zerî domama min tenêye li deşta xalî
Tu xema neke, evîntîya dila pozmîş nebe.

Zerî, qurba, îşev şeva hîveron e,
Çira konê reşî erebî da dişxule,
Domamê, çira tijî mûm û don e,
Xelqê here qirş û qalan e,
Ez bême dizîya zer-memka ne.

Sîyabend ajot û ji Xecê dûrket,
Xecê dixwest dîsa tiştekî bêje,
Lê zimanê wê hate girêdanê,
Lingêd wê sist bûn û xwe wundakir,
Çavê wê ma li rîya Sîyabend,

Ker û lal rûnişt, cîda ma.

De Sîyabendo, Erebistanê bi mil e,
Delalê min sîyarê hespê qul e,
Teyê dilê min kirîye kanîya agir e,
Tu vegere bibe qinîata dilê min e.

Çi mirazê mal li gunda,
şerê, rojê xem di dilda
Nola sîtilek e, çar çemil e, agir binda,
De tu veger, derda nede ser derda.

Çiyayê Erebistanê wê beroj e,
Sîyabendê Silîvî xweş dengbêj e,
Delalo, de tu vegere, çend gilîya bêje.
Ez birîndarim, tu dil-hinavê min nepêje.

Ez xerîb im, ne li vir im,
Qalçîçeka ber kevir im,
Ezê hîviya te li vir im,
Minê sond xweriye kesî ra nebim hogir im.

Hîv kete bin ewra,
Hespê şê difire nolî teyîra,
Ez cahil im nolî gogerçîna,
Ezê hîvîya te bim li vira.

Lawko, naziko, çira vêxistî
Danîne ser van teneka,
De tu were emê bikevine kêf-heneka,
Nemama qerewil girtine,
îsal dane ser kuleka.

De tu bi altdarî veger, delalîyê min,
şewqa çavê min, delalîyê min.

Herê Sîyabendê min î şengîn e,
Tîmarekê li hespê şê dixîne,
Destê xwe dide zînê zerî mêrdînîye,
Çeka li destê xwe da dişidîne,
Lingê xwe dike zengûyîyêye.
Dide orta xwe û zînê mêrdînîye,
Rima qesaye, hêdî-hêdî ajotîye çûye.
Hewara her heft birêd Xeca zerîn e,
Ay sîyaro, delalo, mêrxaso, sîyaro.

Ewa hanê Xeca zerîn e,
Boy Sîyabend dibe kuleke giran û birîn e,
Sîyabend qewata teze topkir û çû.
Zef çû, hindik çû, hilkişya serê çîyê,
Wî çîtê mêra dît li hindava,
Wê ketine şerê giran, nolî seva.
Li deşteke bê hed û hesab da.
Ji alîkî birêd Xecê çadir lêdabûn,
Ji alîyê dinê jî cerdê çadir lêdabûn
Sîyabend lezekê nihêrî alîyê şerkara.
"Herme alîyê kê,"?— fikirkir.

Sîyabend:— „Wekî herme alîyê birêd Xecê,
Cerda mîrê ereba wê min hesabkin kubar,
Wê ser min bikenin timcar,
Wê bêjin: qurebû, çû pişta hindika,
Lê wekî herme alîyê cerda pira,
Birêd Xecê wê bêjin: tirsonek bû,
Nemerd û bêhiş bû, çû alîyê zehfa.
Ji hemûşkî rastir e, wekî ez orta
Wana ra bajom û silavê bidime wana,
Ezê herme pişta wana, kê silava min hilda.
Usa jî kir, ajote orta wan,
Hespê xwe da sekinandinê, silav da,
Her heft birêd Xecê bi şîrin silava wî hildan,
Sîyabend pêra-pêra ajote alîyê wan,

Ji hespê peya bû, bi wan ra bû yek.

Cerda mîrê ereba dîtin,
Çawa Sîyabend berê xwe guhast,
Çû alîyê birêd Xeca zerîn.
Sîyabend hela rihet nebû,
Cerda mîr şer destpêkir,
Birêd Xecê hazirbûn, wekî herne şer,
Lê Sîyabend gele tewaqe ji wan kir.

Sîyabend:-Sekin, qebîlvanêd min, birayêd min.
Nav we da ji min mestir heye,
Nav we da ji min biçûktir heye,
Ji min nexeydin, gilîyê min sekin,
Ez merîkî xerîb im û dereke,
We tu car ez nedîti me,
Û hûn tu cara min nas nakin.
Ez hatime vira, min silav da we,
Cerda mîr silava min hilneda,
Nexwestin min binhêrin, ez bêhurmetkirim.
We caba silava min hurmetî da,
We ez qebûlkirim nolanî bira.
Niha gilîkî min ketîye alîyê we,
Ez teweqe dikim hûn gilîyê min,
Çawa qebîlvan û bira texsîl nekin,
Eva çend roje hûn şer dikin
Pêşberî cerda mîr, hûn westîyan.
Dîya mine delal t'emî daye min,
Ku ez timê pişta barê ketîbim.
Hûn werin xebera min bikin,
Hûn lezekê li vira hêsabin,
îznê bidin ez îro pêşya cerdê şerkim,
Birê Xecê dîtin Sîyabend destpêye,
Jê sawê digirin nolî mêrê kulêye,
îzna Sîyabend dan tenê vir derê,
Nîşande zerpa şerê qurbetîyê.

Sîyabend wê lezê li vira sazbû
Ser pişta hespê şê ew zû sîyarbû.

Rima qesayî da orta xwe û zîn,
Hicûm kire ser cerda mîre mezin.
Wexta Sîyabend hindav da rabû
Cerda mîrê ereba şabû,
Wekî merîkî tenê hicûm dike.
Wana çar alî ajotine ser Sîyabend,
Wekî wî mêrî zû dîl bigirin,
Ji mîrê ereba ra pêşkêş bînin.
şerê giran destpêkirin,
Sîyabend pêşîya cerda mîr dagerand.
Pêşî li ser paşîyê da vegerand
Xwîn kişîya nolî avêd cew-kaniya.

Herê Sîyabendê min î şengin e,
Tîmarekê li hespê şê dixîne,
Hespê şê quloz dibe ezmîne,
Pirîsk dipekîyan ji gema nav dirana,
Hîrîn dikete nav best û meyîdana
Zengû tenişta hespê dixîne,
Derbê wî mêrê kulê ditirsîne,
Rimê dihejîne, pêşya cerda mîr dizivirîne,
Bi şêrî pêşîyê ser paşîyê da vedigerîne.

Cerd û qumandarêd mîrê ereba,
Hela nava tarîqa xwe da şerê wa
Nedîtibûn, ne jî binîabûn.
Xwîn bûbû nola ber û dikişya,
Deng û nalînêd brîndara ew deşt hildabû,
Dengê nalînêd wan derdikete ezmana.

Cerd û qumandarê mîrê ereba
Ser hişê xwe da hatin,
Wekî tu çar û mikan tune,

Ewana sax û silamet nikarin
Ji destê Sîyabend xilasbin.
Hinek revîn ber bi malêd xwe,
Xilasbûn ji nav wê belayê
Gelek ji vira hatine rayê.

Sîyabend wexta vir bala xwe dayê,
Nîvê cerdeyî pir vira belengaz in,-
Kesîbî li wana tim dikin gazin.
Wana bona kara mîrê ereba
Vira xwîn dirêt, serê xwe dida,
Gilîyê dîya wî kete bîrê,
Wekî komekê bide feqîr û fiqara,
Ber bi wana zivirî û gote wana:-

Sîyabend:— Sekin, bindestîyêd mîrê ereba.
Hûn xweyê jin û zara,
Vir mîr hûn xapandine anîne erdê kurda,
Ji şerê mîra kê dîtye kar?
We mala xwe hîştîye tengezar.

Ser erdê dereke xwînê dirêjin,
Herin malêd xwe, hûn zû vegerin,
Jin û zarêd xwe ra îdarê destxin,
Heger hûn bên vir dîsa şer bibe,
Bira gazina we ji min tunebe.
Hûn çima bona wê kara mîra,
Xwe dikin şerê qîr û sîra?
Bira hişê we li serê we be,

Gereke şerkin pêş dujmina
Em birane û nolî bira.
Orta me da şer diha tunebe.
Paşî vê gotinê Sîyabend ew azakirin.
Û ewana bi dil-ced bona vê yekê,
Gele şabûn û razîbûna xwe dane Sîyabend.

Vir girêdan birînêd birîndara,
Ew rûniştandin ser e'reba,
Çî wan hebû temam topkirin,
Serê xwe ji Sîyabend berjêrkirin,
Xatirê xwe ji Sîyabend xwestin û çûn.

Sîyabend zivirî bal her heft bira.
Birêd Xecê bi cerga nêzikî Sîyabend bûn,
Destê xwe dane wî û altkirin pîroz kirin,
Çavê wî ramûsan û qewîn hemêzkirin.
Nava heft bira vir birê mezin
Ji Sîyabend pirsî bi zarê lêzim:

Birê mezin:-Ev hemûşk îro pak hate sêrî,
Em zef razîne ji te fêrizî!
Lê em nizanin, kê dilê me şakirin,
Ji vê qezya nepak em xilaskirin,
Birê nenas, navê te bi xêr,
Nav jî mêra re timê dibe mor.

Sîyabend:— Navê min Sîyabendê Silîvî,
Ewledê kurda, pişta belengaza,
Ez hogirê wan im, kê min dixwaze.

Birê mezin:— Sîyabend bibexşîn, ez gilîkî bêjim,
Em heft birane, tu çawa dibînî,
Tu jî bibe birê mey heyşta,
Nêta te derheqa vê yekê da çîye,
Tu bi gilîyê min ra gelo razîyî?

Sîyabend:— Belê, ez bi gilîyê te ra razî me,
Ez zef ji wî qedirî şa me,
Ez qebûl dikim gilîyê we şêra,
Ez zef razî me ji hurmeta wa.

Birê mezin:— De wekî usane, birayê me qîmet,
Me te ra nekirye tu qulix-hurmet,
Ez çawa birê mezin, gilîyê min seke,
Bi çi qîmetî jî mabe, çi tiherî hebe,
Tu derê qonaxa me vira veke.
Gerekê tu heftekê bibî mêvanê me.
Sîyabend razîbûna xwe da,
Wekî heftekê bibe mêvanê wana.

Birê mezin:— Qereman, tu zû here, birê min î biçûk,
şuxulda egin, tu şer da çapik,
Cabê bide xwûşka me ya nazik,
Wekî em bi altdarî,
Îro tevî Sîyabendê Silîvî,
Emê bibine mêvanê wê,
Çawa mêrêd altdare ezîz.
Alî bike wekî xwûşka me nergîz,
Tiştekî xweş ji me ra hazirke.
Tu şuxulê birê meyî mêrxas,
Bêy me Xecê ra wira nekî nas.
Tu gilî û gotina nevêjî,
Bira bi xwe Sîyabend ew bibîne,
Gelo wê birê me teze bihebîne.
Binêre, çika wê çi bêje,
Wê çawa nêzikî wî qebûlke.

Qereman vira nolanî teyra
Ji cî livîya, te digot difirîya,
Lê bira dane pêşîya Sîyabend,
Hêdî-hêdî ber bi konê Xecê livîyan,
Ewana çiqas nêzikî konê Xecê dibûn,
Hewqa dilê Sîyabend davît, şadibû.
Qerf û henek, eşq, laqirdî,
Bi kilam û metelokê kurdî,
Ber bi Xecê dibûn û rê kindibû,

Nav wana da Sîyabend kerbû,
Gele melûl û difikirîye.
Te tirê ewî altdarî nekirîye,
Meriv tirê ewî namûsa Xecê xilasnekirîye,
Meriv tirê ewî senedikr kêf û henek,
Kilam û metelok, xeberdane bieşq.

Eman-eman, eman-eman,
Delalê, ba tê, baran pêra dilîlîne,
Kewa gozel kanya jêrîn avê tîne,
Dirîya xwedê cêr giran e, qet zirav e,
Qolanê milê zerya min dêşîne.

Ezê hevraz çûm, berjêr hatim,
Kêleka kon rastî kewa gozel hatim,
Bengzê vê torinê usa tûjbû,
Mîna rima qesayî ez hingavtim,
Qudûmê çokê min sist bûn,
Hestîyê çokê min xweber çûn hatin.

Eman-eman, kulmalê ezê kavlê
Konê reş da ketim pêda-pêda,
Kula kor mala bavê ketê,
Tayê dilê min kirye mînanî
Kizirka ser sêlê, gurzek darê Erebistanê binda,
Alav-agir girtîyê, qirîn pêda.

Eman-eman, terezê çîya bilind e,
Kavlê gunda te nabînim,
Gul û gîha şînbûne, naçirpînim,
Agirê kulê mala bavê ketê
Ezê terezê di gunda da
Tu dilî ser dilê xwe û te ra nahebînim.

Dengê Xeca nazik hela
Guhê wî da dikire zinge-zing.

Dengê Xeca delale, kubar,
Ji ber çavê dûr neket.
Sufetê Xecêy delal û bedew,
Ji nêt û fikira wî dernediket.
Ew bi fikirê li bal Xecê bû,
Ew diponijî û difikirî:
Çawa Xecê wê nêtê bixwazin,
Ewê çawa caba wan bide,
Ewê çi hesabî pirsê wan qebûlke.

Lê Xecê xwarin hazir kiribû,
Kêlekêd texte belgî rêz kiribû,
Ew jî ber derî sekînîbû,
Hîvîya hatina birêd xwe bû,
Qereman wê ra tiştek negotibû.
Lê dilê wê jê ra şedetî dida,
Ew bi birêd xwe va hîvya wî bû,
Yê ku rihetî û xewa wê herimandibû,
Yê ku dil hinavêd wê maşandibû,
Xweyê hespê şê û rima qesayî.

Paşî gele sekinandina giran,
Berevarê ewê ew dûrva dîtin,
Çaxê ewê dît sîyar ji çîyê
Jorda hêdî-hêdî dihatine xar,
Xecê zû-zû, ji cîyê xwe rabû,
Xwest bibeze pêşîya wan,
Xwe bavîta stûyê hespê şê,
Lê bi qanûna kulfet xwe vegirt.
Ji şerma sorbû,
Serê xwe berjêr kiribû,
Ber bi kon hêdî-hêdî çû,
Birê wê hatine ber derî,
Birê mezin kon da Xecê ra got:-

Birê mezin:-Me ji xwe ra birakî

Teze anîye, xwûşka delal,
Binêre, gelo, begem dikî?

Xecê:— Birê we mêvanekî qîmet e,
Mêvanekî hurmet û sîyanet e.
Mêvanê ezîz yê xudêye,
Çawa dikare biqewime Xeca te
Qebûl neke mêvanê, ku te anîye...
Lê çima ew derva sekinye,
Lê çima nayê û silavê nade?
Bêjine wî xortê nazikî, delal-
Ser çavê min, ser serê min ra hatîye,
Hergê dixwaze rastîyê bizanibe,
Dilê min da jî cîyê wî tim heye,
Bira keremke bê malê rûnê.
Paşî vê gotinê xwe,
Xecê cêrê avê hilda,
Zû, zû ji kon derket,
Paşî derketina Xecê ji kon,
Birê mezin tê derxist,
Wekî dora textê nan,
Dewsa heft belgîyê nerm,
Xecê heyşt belgî rêz kirine.
Ewî famkir, wekî bi wan ra
Xecê hêvîya yekî din jî bûye.
Lê kiye ew, Sîyabend e, yan yekî din,
Ji wîra çetin bû bizanbe.

Birê mezin dile xwe da qirarkir,
Derheqa wê yekê da bira ra nevêje,
Lê bi şik li Xecê binêre,
Bê deng û his bala xwe bide.

Xecê derkete der,
Av bir, wekî mêvanê ezîz
Wira destê xwe bişon,

Bi ava kanîyê lingê xwe bişon,
Wekî hinekî wira hêsabin.
Bi merîfetî gazî wan kir,
Wekî xwarina bi destê wêy
Nazik û torin hazirkirî, bixwun.
Mêvan û birêd wê hatne hundur,
Rûniştin, xwarin, vexwarin,
Pala xwe dane belgîyêd nerın,
Xeberdan û bê xem rihet dibûn.
Êdî nêzîkîya nîvê şevêbû,
Xecê tenê kon da hişyar mabû.
Ji bengîbûnê serxweş bûbû,
Ser belgîyêd xas paldabû,
Destêd xwe dabû ber eniyê xwe,
Dilê cahil dikelîya û eşq dida,
Kilama dilketiya distira.

Kilama Xecê:— Eman, eman, eman,
Eman, eman lawko decan,
Lawko qurban, ne li vir im,
Ne li wê me, tevya tevî bême.

Ez gul im, gula van bihara
Timê ber bîna bedew û yara
Seba xelqê, nolanî strînê me ra,
Seba lawkê xwe nolanî karbara.
Eman, eman, eman, eman,
Eman, eman lawko decan,
Lawko qurba, de min go,
Rênga dila naçe dila.

Agirekê ketîye koka mexîna,
Têda dişewitê baxçengê gula.
Minê sondekê xwarîye, sonda temam,
Xenjî lawkê delal, destê kesî,
Neçe nav van memikê gulday.

Eman, eman, eman, eman,
Eman, eman, lawko decan,
Lawko, qurban min kavlê
Gundê me derece,
Lê şîn dike, ket û lavlavka guh pence,
De tu were vê sivê
Ramûsanekê min evdalê keremke-
Ew dermanê canê te ra
Çiqas ferz û qenc e.

Eman, eman, eman, eman,
Eman, eman, lawko decan.
Lawko qurba, mala digerî,
Malê meye wane,
Tu hêsyê binêre kon xuyan e,
Gava dibîbek canê lawkê min
Welatê xerîba bigere,
Vira nevsa canê min eyan e.

Eman, eman, eman, eman,
Eman, eman, lawko decan,
Lawko qurba dilê min
Steyra berî benda,
Ezê dîna xwe didimê,
Gulî wê kewa gozel,
Daketine ser gulavdûnê,
Herdu zenda.

Dengê wê kilama zerîyê,
Te digot tevî şirekê kanîyê,
Ji çîya dixulxule, jor da tê,
Tê û meriv dide ber pêla,
Dixe nav reza, dixe nav gula,
Û dide meriv qanat û mila.
Ji dengê wê kilamê
Sîyabend berî hemûşka,

Ji xewa şîrîn hişyarbû,
Gele hêdî rabû,
Usa ji kon derket çû,
Tu kesek pê nehesîyabû.

Ew çû ser devê kendalekî,
Gelek wext ker û lal sekinî,
Rast berê xwe dabû rohilatê,
Ewî bi nêta tevhev guhê xwe
Dabû ser kilama Xeca xwe.

Tev teze ji çiyê bilind bûbû,
şebeqa sibê her heft bira rabûn
Derketina der, dora Sîyabend,
Topî serbûn rûniştin,
Birê mezin ji wî pirsî.

Birê mezin:— Saxbe birê mey bi qîmet,
Çibûye, çi te qewmîye?
Tu du nişkêva herafê meydanê,
Nava şer da birîndar nebûy?
Yan jî birê me tişt te ra gotine,
Çima usa me'dey û kêfa te tune?

Sîyabend:— Na, na, birêd mine şîrîn,
Ez silamet im, mereq nekin,

Birê mezin:-Lê tu çima şebeqa sibê da
Rabûyî ser vî kevirî rûniştî?

Sîyabend:-Sibe safî nebibû, ez ji xewê rabûm,
Nêtêd mine tev hev mecal nedidan,
Wekî min bikarbîya razama,
Ez rabûm hatme vira,
Wekî ez rohilata dinyayê
We binêrim û bi çavê xwe bibînim,

Nêtêd xwe bidime belakirinê.

Birê mezin:-Hergê usane, birê Sîyabendê
Niha texte rastkirinê,
Xecê hêvîya me sekinîye.
Keremke em herne kon!
Taştê hazirkirye,
Paşê emê çarekê bibînin,
Nêtêd teye tevhev
Bidin belakirinê, kêfa te xweşkin,
Herine çîyayê kewêd gozel
Rav û nêçîrê hevra bikin.

Bira gele şabûn, kêfbûn
Gula enîya wan geşbû.
Zû-zû taştê xwarin,
Li hespa sîyar bûn,
Ajotin ber bi çîyayê nêçîrê,
Êvarê ji nêçîr vegerîyan kesrî,
Bi kêf û kilam ser kûra agir,
Ji hevra hurmet dikirin.
-Rojtira dinê çûne mêşe,
Nêçîra gakûvîya û bizinêd kûvî
Usa bi henek û şayî dem derbasdibû,
Ro derbas dibûn, ro diçûne ava,
Lê Sîyabend timê mitala da dima.
Ne Xecê, ne jî Sîyabend,
Bi eşq tevî wan nedibûn,
Bi his hev dinêrîn, gul didan.

Herro gula dilê wan şax dida,
Lê huba wan hemû tişt dida,
Fikirdikirin derheqa umrê xwe da.
Sîyabend îzin nedida xwe, edetê mêvanîyê,
Û wî emekî bide pêpeskirinê.
Lê Xecê tucara berê îzn nedida xwe,

Usa dimeşîya şev û ro, hesab dida,
Ji bêxwewîyê rengê wê hatibû guhastin,
Çavê wêye reş-belek sor bûbûn.

Lê ew timê başqe dibû,
Kilamê bengitîyê digot, distira
Bi kilama hêsa dibe dilê yara.

Xecê:— Ez xerîb im ne li vir im
Qalçîçekê ber kevir im,
Lawkê min diçe seferê,
Dilê min bûye kevrê berê.

Delalo qurba, çûme şamê,
şame li van t'eta
Kolos qot-kirîye nolî egîta,
Rîşîyê şerê daketîye ser sûreta.

Lawko, qurba, şev şeva min e,
Goşê orxanê hilde were bin e,
Delalîyê malê ez û tu ne.
Emê têkevine kêf-laqirdîyan e.

Lawko tûsizo, îşev şeva înêye,
Destekê hatîye nava sîng-berê,
Min çavreşê, min xatûnê,
Na welle, min gogerçînê.

Lawko naziko çira vêxistin,
Danîne ser van teneka,
De tu were emê bikevine kêf-heneka,
Mêrxasê min, delalîyê min
şewqa çavê min, delalîyê min.
Birêd Xecê hela kilamêd usa
Ji devê Xecê senekirîbûn.
Kêm xeberdan, mitalê Sîyabend.

Kêm xeberdan, mitalê Sîyabend .
Kilamêd Xecêye bengitîyêye,
Ji ber çavê birê Xecê mezin,
Bê şik nikarbû dûrketina.
Ewî famkir, wekî Xecê û Sîyabend
Bêhesab ji hev hezdikin.

Wekî ew îzbatî bê bawerkirinê,
Gazî Xecê kir, jê pirskir, wêderê.
Lê rojtira dinê, wextê nêçîrê,
Sîyabend ra gelek hûr xeberda,
Wê demê hemû pêva eyan bû,
Gazî birêd xwe kir û nêta wan pirsî,
Derheqa wê yekê da bi îclasî:

Birê Mezin:— Hûn çi dibêjin, nêta we çiye?
Gilîkî wa pêşîya me danîye.
We qet tê demanîye,
Wekî Xecê û Sîyabend hev hezdikin.
Kevir jî ber huba wan dimeşin.
Ez çawa mezin, Xecê û Sîyabend,
Ewan şabûna xwe zeft nekirin,
Rastîya gilîyê xwe min ra kirin.

Paşê birê ortê, Tihar,
Bi dengekî nimz got,
Û birê mezin dengê xwe birî,
şeş birê Xecêye nazik nihêrî.
Temam kerbûn, serî li ber da,
Tu kesî nikarbû zû xeberda,
Tu kesî nikarbû gilî bigota,
Dilê biratîyê vira dikuta,
Boy xwûşka nazik, boy xwûşka delal,
Boy Xeca zerîn, delalîya hemûya,
Lê birê ortê, navê wî Tihar,
Hêdîka ew cîyê xwe rabû pîya,

Zivirî û paşê gote bira:-

Tihar:— Em qet nizanin kîye Sîyabend,
Rast e, ew mêre û mêrekî zef merd,
Lê gelo heye hebûna wî û cî,
Yan xwûşka me here maleke birçî?..
Ew bênamûsîke zef mezin e, bê hurmetî,

Dertê, me xwûşka xwe da wî bi tirsê.
Gilî pey gilî û pirs pey pirsê
Sibê wê bigîje mîrê ereba fikra tirsê,
Wekî em tirsîyan ji mêrekî nenas,
Û ber wîya em bûne palas.

Qebîla mîrê ereba wê heta-hetayê
Me ra bikişîne dujminatîyê.
Û wê rojê û şevê qebîla me
Bin şûr va bide derbaskirinê,
Yan hebûn û tinebûna me
Wê agir berdê bide şewtandinê.

Ew pirs zor û çetinbû,
Çawa bikin, wekî Xeca zer
Bextewarbe, ew yeke tenê bû.
Ew bermalîya mala wan bû,
Ew hizkirîya birêd xwe bû,
Usa jî neduxwestin, wekî
Mîrê ereba bibe dujminê,
Wanî ji bav û bapîran.

-Bawerkî rast dibêjin, wekî
Du levhatin, du bextewarê nazikî,
Vê dinya pûçe vala da nikarbûne,
Bihevrabin û hevra jî nebûne!..
Ev xeberdan tevhevkir birê biçûk.

Qereman:— Ez li vira ji we hemûşka
Yê herî biçûk im, gelî bira,
Gilî weyî sere qet nagîje min.
Ez wê yekê zef rind dizanim,
Hergê birê min î mezin
Îznê bide, çawa birê biçûk,
Risqeta min wê hebe,
Wekî ez gilîyê xwe bêjim.

Birê mezin:— Xeberde, Qereman, îzna te didim,

Qereman:— Wekî mîrê ereba bibe agir.
Tu cara nikare tiştekî bike,
Qet nikare ziraré bide me.
Ewî bi cerda xwe yê giran va,
Ser me da dihat, nolî xunava,
Gelek cara hucûmî ser me kir,
Gelek cara dest şerê giran kir,
Lê tişt ji wî ra lev nehat.
Ewî tiştek ne dihêvcand,
Wekî me bike hêsîrê bedhal
Me dîl bigire, me nehêla hal
Wekî ela xwe me bide kenandinê,
Lê ew yek wî ra qet lev nehat.

Em wî çaxî heft birabûn, heft mêr
Lê niha em heştin, hemû nolî şêr
Niha bi me ra ne Sîyabend, delal e,
Lê Sîyabend fêrizekî helal e,
Fêrizekî layîq delalîyê birane.
Ew jî cerda mîr netirsîya,
Ji hemûşka rindtire, em nebine sebeb,
Boy xwûşka nazik, nolanî kewkeb.
Vir tiştê zorê ortê tunîne,
Kesek zorê Xecê nastîne,
Me ra tu bênamûsî nîne,

Wekî xwûşka xwe didne wî kê begem dike.
Lê wekî du dil, nolanî du gul,
Hevdu ra dibin şalûr û bilbil,
Xwe bera nekin, miraz gunene,
Aykê wana ber çavê me ne.
Wekî Sîyabend nemerd bûya,
Wê hela berî şer gelekî hêsa,
Xecê birevanda, bibira xwe ra,
Dibe em heta-hetayîyê,
Pê nehesîyana û me ew nedîta.
Lê ew niha birê mey ezîz e,
Ew usa xwe alçax xwey dike,
Çawa merîyê malê û fêriz,

Nola bûka xwe xwey dike,
Meriv nizane, wekî ew mêrxas e,
Ji vê yekê şûnda eyan e,
Wekî ew tenê layîqî me ye,
Layiqî Xeca torin û nazik e.
Xecê dikare tenê bibe kulfeta wî,
Bibe bermalî û siheta wî,
Ne ku bibe hêsîra kurê mîrê ereba.
Û sibê jî me bidin ber derba.
Me Xecê xilaskir ji devê dujmin,
Niha hûn dixwazin wê para bidin...

Hergê min vira û zêde,
Bibaxşînin, gelek xeberda,
Lê hûn bizanibin, ez çûkê we me,
Lê aqil ne çûktîyê-mezintîyê da ne.

Birê mezin:— Na, na, Qereman can,-birê delal,
Te rind xeberda, fikra te zelal,
Te ew got, çi ku me hemûşka xwast,
Fikirkirin, bona xwûşka xwe
Ji Sîyabend çêtir em zava nabînin,

Û tu kesî em nahebînin.

Roja mayîn, wextê sobetê,
Birê mezin neta xwe ji teva re got,
Wextê ew yek sekirin, gelek şa bûn,
Gustîlkêd wan hev dane guhastin.
Rengê Xecê hate cîyê xwe yê berê,
Gula rûyê wê geş bû, şemalê da nederê
Bengzê wê, meriya ra dikenya,
Çavêd wê ye reş-belek guldan.
Hergê heta hingê Sîyabend,
Ker û lal, ro derbas dikir,
Diqiçqiçî, xwe da dikelîya
Ji wê yekê şûnda bû bilbil,
Du şev û roja kêf kirin,
Xeca zerîn nîşan pê va kirin,
Roja sisîya Sîyabend bira ra got,-

Sîyabend:— Birêd min yên biqîmet!—
Hergê hûn îzna min bidin,
Ezê herme mal bê eglebûn,
Kincê layîqî Xecê bidime hazirkirinê,
Karê dewetê bidime kirinê.
Nava çend roja da ezê kutakim,
Bê eglebûn ezê vegerim,
Xwûşka we ya delal, rihetîya dilê min e,
Bona birina Xeca zerîn hûnê bêjin,
Çawa rê têra bibînin emê vira,
Dewetê bidine teşkîlkirinê.
Paşî wê yekê bi qeweta bira
Emê bikevine rê da,
Destê xwe bidine destê hev da,
Herin bal pîredayka min da,
Wekî ew jî Xecê bibîne,
Çavê wê tijîbe, dilê wê şabe,
Rengê wê vebe, dilê wan rihetbe.

Her heft bira gilîyê Sîyabend
Bi dil û eşq qebûlkirin.

Sîyabend berbanga sibê
Zîn da ser pişta hespê şê,
Kete rê, ajot ber bi êla axê.

Herê Sîyabendê min î şengîn e,
Tîmarekê li hespê şê dixîne,
Lê dike zînê zerî mêrdînîye,
Tengê berê wî ser hev da dişîdîne,
Lingê xwe dike zengûya zîne,
Dide orta xwe û zînê zerî mêrdînîye,
Rima çarde movkîye qesaye,
Dajo hêdî-hêdî ber bi êla Ehmed axaye
Deşt û zozana ra çûye,
Ay li minê, sîyaro delalo, mêrxaso.

Wextê Ehmed axa pêhesya,
Nêta para zivrandina Sîyabend,
Çapa şabûna wî tine bû,
Ewî hazirbûna dewetê dît,
Xercê dewetê hilda ser xwe,
Wekî Sîyabend diha vir nemîne,
Bikaribe here zû dergistîya xwe bîne.

Emir kir, wekî kêleka konê wî,
Bona Sîyabend û Xecê cîyê kon hazirkin,
Konekî fire û bedew vegirin.
Ji Xecê ra, çawa bûka wî,
Nîşanîyêd xas hazirkin.
Merî topkirin, wekî Sîyabend ra,
Herin bûka ezîz û delal bînin,
Wekî bi kêf û şayî herin, vegerin.
Çend roja şûnda Sîyabend

Bi kome siyarêd dewetê ra.
Bi gele pêşkêşêd mezin va,
Bi hazirbûneke mezin rêketin,
Xeca zerîn bi kêf û eşq bînin,
Êl hemûşk derket û Sîyabend verêkir,
Qîz û bûka gele hevsûdî kir

Û bêsebir hêvîyê bûn,
Wekî zû bibînin wê bextewarê,
Ya ku bibû xweya dilê Sîyabend,
Wa bi kilam û şayî Sîyabend verêkirin.

Herê lao, me bi lawîne,
Kulmalo me bi lawîne,
Kur hatye min birevîne,
Tûncika enîyê hilîne,
Zozan, zozan bigerîne,
Helanê jorîn xîne,
Helana çevkanîne,
Çevkanîya gul çinîne,
Yek şor e, yek şîrin e,
Sîngê min jî birîn e,
Zimanê te lêdikeve deşîne.

Herê lawo, me bi lawîne,
Kulmalo me bi lawîne,
Kur hatye min birevîne,
Orta gund rê tunîne,
Min bavê qerpûsa zîn e,
Rê dûr e, te nabîne,
Hêlan-hêlan bigerîne.
Hêlana cot kanî ne.
Herê lawo, me bi lawîne,
Ava şamê şîrîn e,
De tu zûke, min birevîne,
Teng û bera bişidîne,

Tilya lawik birîn e,
Min şandîye hekîm bîne,
Hekîmî derewîne,
Hekîmî mal da nîne.

Herê Sîyabendê min î şengîn e,
Tîmarekê li hespê şê dixîne,
Lê dike zînê zerî mêrdînîye,
Teng û bera ser hev da dişidîne,
Lingê xwe dike zengûya zîn e,
Dide orta xwe û zînê zerîn e
Rima çarde movkîye qesaye,
Hêdî-hêdî ber bi Xecê ajotîye çûye,
Ay lawiko, sîyaro, mêrxaso delalo.

Sîyabend hela teze çûbû,
Ji her heft bira qetîyabû,
Hela çavê Xecê ya reş û bedew,
Ji hêsira ziha nebibûn,

Rokê teze tev zeriqî,
Sîngê çîya ra dibiriqî,
Komek sîyar ser pişta hespê erebî,
Ber bi konê birê Xecê dimeşîyan.
Pey wan ra qenterêd devê bazirganî,
Barê wan tijî, wan pêşkêş danîn

Ew kurê mîrê ereba
Kefîlê xwe şanda cem heft bira,
Wekî wira wana lev bînin,
Wir zêra rêkin, dilê wan bistînin,
Û gilî hildin, ku Xeca zerîn
Bê mala wan da timê bibe zey.
Bira xirab be timaya dinê,
Çawa ew merîya dike nav telê.
Wexta zêr, zîv dane ber wana,

Dudilî kete nav dilê bira.

Û tiştê nedî, tiştê nebîna,
Wana vir hilda hesabê dîna.
Destî nepaka, destî bêbexta,
Mirazê cahila dikete ber şexta.
Nêta xwe guhastin viraya wana,
Wekî niheqî Xecê dan Sîyabend
Ji wana gele poşman bûn,
Wekî bextê Xecê girêdan,
Bi merîkî usa ra,
Tenê dayke wîya pîr heye,
Nav û dengê wî axatîyê tune.
Merîyê wî dewlemend tune.

Birê mezin hemû bira topkir,
Wan ra bi dilêş got:-

Birê mezin:— Sekin, birano, em heftbûn,
Me xwûşka xwe nîşankir,
Bi merîkî ne eyan ra,
Bi altdarîya wî hatine xapandin,
Bi mêranî û rindaya wî xapîyan,
Me bîrkir, wekî ew ne beg e, ne axa,
Usa jî pismamê wî yê kivş tine ne.
Çi Silîvî, çi Sîyabend, ev ne giliye
Dostê sekin, dujminê sekin,
Xelqê wê çi bêjin ji me ra?

Ewê xwûşka me ya delalî xaykirî
Wê çawa lê binêre, çawa xayike?
Ew yeka ji navê me ra,
Ji nav dengê qebîla me ra
şerm e, kirêt e û bênamûsiya
Heta-hetayîyêye bona me.
Hemûşkî çêtir nîne, wekî em

Merivatîyê ji kurê mîrê ereba ra
Bidine qewînkirinê û bivine merîyê wana.
Lê Sîyabend merikî ne kivş e,
Em nizanin wê çawa Xecê xayike...

Ji wana geleka gilîyê birê mezin
Bi kêf û eşq qebûl kirin,
Pêşberî wê yekê xeber nedan.
Heta wî çaxî Tihar tenê pêşberbû,
Lê Qereman wî ra razî nîbû.
Ew pêş da hat û wa gote bira:

Qereman:— Niha êdî şerm e em sozê xwe
Para hildin, ew nemerdîye,
Em nikarin soz bidine mîr,
Me sozê xwe bi şer da kutakirinê.

Lê emê çi caba Sîyabend bidin,
Çi bêjin, çava lev bînin.-

Qeraman êdî nikarbû
Xwe zeftkira û lê zêdekir-

Qereman:— Ev yek ne mervatîye,...
Xecê ji wî hezdike,
Ew jî Xecê hezdike,
Ne ewan gustîl hev guhastin,
Gele şerm e, şerm e, birano!
Lê birê mezin kir qarîn,
Gele hêrsa xwe rakir-

Birê mezin:— Dengê xwe bibir, bêedeb,
Tu çi famdikî, çiye şerm!
Min qirarkirye, heta Sîyabend
Venegerîyaye, nehatye, mîr ra
Û kurê wî ra pevkevim,

Pêra-pêra dewetê bikim.

Ewana konê Xecê jor da anîn,
Zû-zû topkirin û li hespa kirin,
Guh nedanê girî û lavayêd Xecê,
Ber bi rîya gundê xwe ajotin.

Wextê çûyînê Xecê tenê,
Bi lez û bi tirs namek nivîsî,
Kire bin kevirê kuçikê kon.
Ew name nivîsîbû bi hêsrê xwe,
Bi derdê xwe, kula dilê xwe.

**PAR III**

Herê Sîyabendê şengîn e
Tîmarê li hespê şê dixîne,
Lê dike zînê zerî mêrdînîye,
Teng û bera dişidîne,
Lingê xwe dike zengûyêye,
Dide orta xwe û zînê mêrdînîyêye,
Rima çarde movkîye qesayîye,
Xatirê xwe Ehmed axa xwestîye,
Bi sîyarê dewetê va ber bi
Xeca zerîn ajotiyîye çûye,
Ay li minê sîyaro, mêrxaso sîyaro.

Sîyabend dest hubê serxweş
Dor berê xwe tu tişt nediqişirand.
Ewî şev û ro dajot, dilezand,
Hespê şê ji ajotinê xwîdabû,
Ew ji sîyarê dewetê
Gele pêş û dûr ketibû.
Hespê şê ji ajotinê
Gele xwîdabû û pişta wî kef dabû,
Wekî siheteke zû bighîje hezkirîya xwe,
Bighîje Xeca xweye horî-perî,

Sufetê wêyî delal û nazik bibîne,
Sîng û bera wê kever şabe,
Tîbûna xwe yê qir û qirstana bişkêne.

Sîyabend hat... hat... lê tiştek nedî,
Ne kon dît, ne jî birêd Xecê dî,
Usa jî Xeca xwe ya biqîmet.
Sîyabend ecêbmayî ma, xwe wundakir,
Xwûdana sar sera avît,
Rengê wî hate guhastin,
Nola merîyê serxweş rûnişt.

Altkirina herafbaşî û li şerê pêşya wî da,
Altkirina cerda mîr û li şerê pêşîya wan da
Xwe wunda nekir, nola piling hicûm dikir,
Lê çi bûbû, çi qewmîbû,
Kê kon hilşandîbû,
Kî derêye Xecê, xwe ne revandine...

Dibe mîrê ereba bi kurê xwe va
Careke din cerd topkirin,
Hatin Xecê bi zorê birin,
Gelo ew sax e, yanê na?
Gelo Xecê kerba çi kirye.
Bi wê nêtê difikirîya.
Dora kon geriya, nihêrî çaraliya,
Wekî nîşanêd şer bibîne,
Yanê jî niqitkê xwînê bibîne,
Nişkêva bin kevirê kûçikê
Hilşîyayî da namek dît.
Name vekir û şaş ma,
Xecê name ji wî ra nivîsîbû,
Derdê dilê xwe jêra gotibû.
Ewî nama Xecê bilind xwend.
-"Sîyabend, hezkirîyê min,
Birêd min te ra bêbextî kirin,

Pêşberî te nemerdî kirin,-
Dikine ser min, dixwazin
Bi zorê min bidine kurê mîr.
Ez wî hez nakim û naxwazim,
Tu zanî, wekî ez gunekar nînim,
Wekî bavê min, biçûktî soz dabû
Mîrê ereba, wekî ez bûka wî me.

Ez ji wî hez nakim,
Dilê min wî da tune,
Ez niha jî wî naxwazim,
Ez tenê û tenê te hezdikim,
Êdî ez kesekî hiz nakim û nakim.

Hergê tu nalî berê
Ji min hezdikî,
Çawa ez te hezdikim,
Hergê mêranî û merîfeta te
Hela li cîdane, ezê çil şeva,
Ezê çil roja kêrê bigirim,
Tasa jehrê bidime ber xwe,
Nehêlim kesek nêzikî min bibe
Heta tu xwe min ra digihînî.

Lê tu kî derêy, azadarê min,
Ez te ku bigerim, ronaya min".
Sîyabend ker û bêhemd qûz bû,
Ser kevirê kuçik lezekê rûnişt,
Destê xwe da ber enîya xwe,
Kûr û dûr, bi melûlî difikirîya.

Ewê usa gelek rûnişta,
Wekî nêzikî wî nebûna,
Sîyarêd deweta wî û Xecê.
Çaxê ewan ber bi wî hatin,
Ewî emir kir, wekî ewan

Pêra-pêra para vegerin.
Hemû pêşkêş û nîşaniyê qîmet,
Para bibin û bidine axa Ehmed
Sîyarêd dewetê hinekî xwe wunda kirin,
Bê gilî e'mir qedandin,
Lê Sîyabend dîsa hespê sîyar bû
Kete riya nenas û dûr,
Kuda diçû ker, bi xemêd kûr,
Hespê şê ew dibire welatê dûr.
Xwe riya Erebistanê ya ne eyan,
Nenas girtibû diçû.

Herê Sîyabendê min î şengîn e,
Tîmarekê li hespê şê dixîne,
Lê dike zînê zerî mêrdînîye
Teng û bera ser hev da dişidîne,
Lingê xwe dike zengûya zerîn e,
Dide orta xwe û zînê zerî mêrdînîye,
Rima çarde movkîye, qesaye,
Hêdî-hêdî ber bi Xecê ajotîye,
Ay li minê sîyaro, mêrxaso sîyaro.

Usa hergê zef çû, hergê hindik çû,
Tenê ewî zanibû „xwedêva" eyanbû,
Rojeke bedew gihîşte avaykî,
Mezin î bilind, sûr dorê kişandî.
Ji dûrî wî avay koxekî
Biçûk dûr va dît û ajot,
Ba koxik pîreke bi sere,
Teşî dest da hirî dirêst,
Bin lêva xwe da dikire gine-gin,
Lê kilama zelûlî nerm digot.

## XERÎBÊ MIN CÎKÎ DÛR E

Xezala min, xezaleke teze,
Lê xwe daye çiyê lez û bez e

Nizanim nifira kê bû go,
Bira neqetîne cî û nîvînê teze.

Qulingo-qulingê hal berîyê,
Xwe daye fêza zerê,
Dengê vî qulingî usa zîz e,
Forma dengê xort û qîz e.

Av anîka sibê ez im,
şûşe, desmala gul gevez im,
Ramûsaneke min keremke,
Ez rêwî me, çiqa lez im.

Dilê min tevîya vê baranê
Girtî semtê vî çîyayê hanê,
Rûbarê kavila welatê Erebistanê,
Delalîyê malê nizanim maye kêderê.

Sîyabend dest xwe da gema hespê kişand,
Wedekî dirêj li pîrê mate ma.
Kere-ker, guhê xwe da kilama pîrê,
Bêdeng û his, ji hespê hate xwarê,
Hêdî nêzîkî pîra kilamgotî bû,
Selameke mêvantîyê dayê:-

Sîyabend:— Êvare te xêr, xêr hezar car,
Dîya min a bedew e, emekdar!
Ez merîkî xerîb û rêwî me,
Ji xizmet û benda ez nekûvî me,
Boy huba merîya ez timê tî me.
Van ax û meskena nenasim,
Dixwazim wedekî êlê ra nasbim,
îznê bide îşev vira bimînim,
Derd û kûlê xwe ber we vejînim.

Pîrê:— Ji linga hetanî serî,

Bala xwe da Sîyabendê Silîvî,
Bi mitalê, li çek û rihelê wî nihêrî
Paşê meriva tirê tiştek kete bîrê,
Gelek rihet û giran caba wî da.

Xwudê bi te ra be, kurê min î rêwî!
Mêvan mêvanê xwudêye delalî,
Tawaqê dikim, keremke tu mêvanî!
Zû e'mirî ser bûka xwe kir,
Hespê şê bikişîne hundur,
Teng û berê wî sistke, debrê bike ber,
Lê ewê Sîyabend bir alîyê dîwanê,
Ser xalîça da rûniştandinê.

Texte rast kirin bi eşîrî,
Çi mal da hebû ser texte danî.
Qulux kirin ji mêvanê nenas ra,
Kêfa wî xweş dikirin bi meteloka.
Paşî qulix û ezetê dunê,
Sîyabend derket mêzeke li hespê,
Dûr va sekir dengê def û zurnê,
Ken û laqirdîya, kêf û şabûnê,
Bi zelûlî vegerîya alîyê malê,
Bi dilê şikestî pirs kir ji pîrê:

Sîyabend:— Dayê, çawa ez texmîn dikim,
Êla we da emir bi şayî dibare,
Merî distirên, vir gale-gal e,
Govend digerin, nolî gogirçîn,
Zurne û def, qûrtîn û qûjîn.
Çima hûn naçin, temaşe nakin,
Çawa merî bi eşq wir derbas dikin?

Pîrê:— Axîneke te'l û kûr kişand,
Li Sîyabend nihêrî û dor-ber reşand:

Serhatîya kêfê û zûrnê pir e,
Serhatîya giran, kul û nifir e.
Tu hê nizanî, tu hê nenasî,
Yek dike, duxwe bi hewasî,
Lê yê din dike axîn û gazî,
Digere birçî, bê kinc-libasî.
Pak dibe derheqa te da, lao, xeberdin,
Rast necaîz e ji rêwiya bipirsin!
Ew çi merye, ji kêderê hatye.
Lê tu bibaxşîn, dilê te fireye,
Xerîbekî min jî, nola te heye,
Li welatê dûr û xerîbistan e.
Veke derdê xwe, min gorîvanê,
Hergê ne sir e, tu min dihîyarke
Nolî dîya xwe, tu min şerm neke!

Sîyabend:-Gelekî li pîrê nihêrî,
Çavê wê yê belek, pozê pîjînî,
Birû-bijangêd reşe qeytanî,
Dêm û sufetê mêranî,
Û metel ma beşerê remî.

Kete bîra wî, dayka wî delal,
Bawerîya xwe anî ji vê pîra bal.
Bawerkir, wekî destê wê bê,
Ewê esey alî wî bike,
Wekî mirazê wî miyaserbike.
Ewî dilê xwe ber pîrê vekir,
Çi ku dildabû jêra şirovekir,
Çi hatî serî oxirmê giran,
Rojê xwe çetin, bextê xwe kovan.
Meriv qey digot ew gunekarîya
Xwe derbasbûy, hildide ser xwe,
Wextê gihîşte nama Xeca zer,
Nişkêva pîrê hilbirî neder,
Melûmetî da, ku xebernede,

Xeber çivîk e, wê tu bermede.

Pîrê:— Bes e, êdî tu dirêj neke,
Heger mêrxasî, quwetê topke,
Serhatîya xwe paşê seke.
Îro timam dibe sî û neh roj û şev,
Xeca zerîn hêvîya te bêxew.
Fîncana jehrê desta digire,
Nahêle kesek ber bi wê here.
Tenê nêzîk dibe carya wê îtbar,
Kul û kesera dilê wê dixwar.

Sîyabend:— Tu bi dil dibêjî dayê can, dayê,
Dêmek Xeca min sax-silamet e?

Pîrê:— Sax û silamet e, heta siba nîvro,
Ew hêvîya te ye hergav û herro.
Qewlê wê sibê nîvro kuta dibe,
Gerekê ji mal derxin wê dilreşê,
Teslîmî kurê mîrê ereba kin.
Dengê def û zurna ku te derva sekirin,
Ew deweta Xecê û kurê mîr e.
Eva şeş roj e, çawa kêf dikin,
Sibê roja hefta timam dibe.
Tu gerekê vir tiştekî bikî.
Evî şuxulî deqekê egle nekî,
Bona xatirê Xeca dêm zelal!
Çi cûrey jî mabe, kurê min delal,
Ezê bikim hûn bigihîjne miraza,
Serê biharê, nolî du reza.

Sîyabend ker û lal hindava derî,
Rast li çavê pîrê dinhêrî,
Sexîl û sêfîl, dilî gorî,
Cî nalipitî awa kevrê seqî, ew kura,
Ketiye pey mitalê sura!

Pîrê:— Dixwazî hema vê şevereşê
Ez caba te bidime Xecê?
Merî nav kêfêdanin, hemû serxweş in,
Tu cara nikarin ew min bibînin.
Wekî bibînin, tu şikê nabin,
Ezê derê para wê mal derxim,
Bi kar û tivdarek bibime gelî,
Tu wê derê bavê terkiya hespê şê,
Bajo ber bi çiyayê Sîpanê xelatê.
Kesek bi çûyîna we nahese,
Hûn kuda herin, kes nabîne.
Heger razîyî, duşurmiş nebe,
Xwe egle neke, şev derbas dibe?

Sîyabend dîsa ker û lal difikirîya,
Nexwest caba gilîyê pîrê bide.

Pîrê kerbûna wî cûrekî din,
Famkir û bi qerf gotê:
-Çîye fêriz, dibe ceger te lerizî,
Ji dengê mêra û bîna kizî?
Yan tu ditirsî tarîna şevê
Hewqasî tu hezdikî ji Xecê?
Ez dinihêrim, çawa tê xanê,
Ji dilê te derket bedewa Sîpanê!

Sîyabend:— Na, dayê, usa nîne, tu usa nebêj,
Ji tefekûriya wê ezim ker û gêj.

Pîrê:— Lê tu çi duxwazî, bêje binhêrim?

Sîyabend dîsa hinekî ker bû û dayê nihêrî,
Paşê çavê xwe cinû kir, caba pîrê da:-

Sîyabend:—Na,dayê,ez nerazî me, naxwazim,
Ez bi xwe ne dizim, şev qîzê birevînim.

Cimaetê çi bêje, çi bifikire,
Wekî Sîyabendê Silîvî hat, nolî diza,
Kete kulîngê, kes lê nehesiya.
Na, dayê can, wekî stukura min jêkî,
Nemerdî û tirsonekîya usa ez nakim!
Ne pêşê min e ew nemerdî,
Bi nemerdîya tu nav der didî.
Ez gerekê ro-nava royê nav deweti ra
Xemila Sîpanê-Xeca xwe bibim,
Ber çavê kurê mîrê ereba ra.
Bira dinê bibîne û bibhê her dera,
Wekî Sîyabendê Silîvî tirsonek nîne,
Heger duxwazî alî min bikî, dîya biqîmet,
Zef ji te dikim lava û rusqet,
Elamî Xecê ke, wekî ez li vir im,
Bira xemêd giran ser ra nexurin.
Tu vê gustîlê bigîne Xecê ,
Û jêra bêje, wekî ew bi cûrekî,
Çawa dest dide û dihebînin.
Bira cîkî kifşke, em hev bibînin.
-Ji wê gotinê şûnda Sîyabend
Gustîla Xecê wî paç kir, da pîrê.
Pîrê poşman bû ku ew da ber t'enê,
Gustîl hilda, xatirê xwe mêvan xwest,
Nola birûskê berê xwe da Xecê rast-rast.

Sîyabend tenê mal da ma, difikirîya
Dûr va qalmeqalma dewetyabû,
Dengê def-zurnê dewetê zîz dihat,
Lê ceger û dilê Sîyabend diket,
Dilê wî da xwîn dikelîya û levket,
Usa rûniştî, cî nediguhast,
Ewî tirê Xecê xewnê da ber çav wî ket,
Ewî Xecê hezdikir, çawa ji Leylê Mecrûm.
Ewî tirê Xecê tenê mal da rûniştîye,
Fîncana jehrê destê xwe da girtîye,

Ewî tirê Xecê tenê mal da rûniştîye,
Fîncana jehrê destê xwe da girtîye,
Ewê nêzîkî lêvê xwe dike, wekî valake,
Lê ewî jî nizanibû, çawa Xecê ra bistira
Wekî ew fîncana jehrê ji destê xwe deyne.

Sîyabend:— Xecê, dilê bengî çi şewat e,
Ber çava nayê tu dewete,
Min daye ber xwe çîya û banî,
Tenê boy nevsa canê te.
Dilê min bager û sur e,
Hişê min ber bi te difire,
Darê dunê da tu tişt nikare
Pêşîya huba me bigire.

Li çîya kanî xule-xul in,
Li Sîpanê tijî gul in,
Xeca min, tu nizanî,
Dilê min tijî derd û kul in.

Ew şeva hana-şeva dirêj,
Fîncana jehrê wêda bavêj!
Ez, merûmê xwedê,
Dest huba dila bûme dengbêj.
Ez dunê va tayê tenê,
Huba min qasî huba dunê.
Xecê, were destê xwe min xe,
Ezê ramûsim naz gerdenê.
Min qusyane xewê şeva,
Bûme teyrê van hindava,
Heta Xeca xwe nebînim,
Ez çava nadim tu ser çava.

Wî çaxî Xeca zerîn tenê rûniştîbû,
Avayîyê tarî, xirî-xalî da fikirdikir.
Carî hêdî-hêdî elamkir û nêzîkbû

Wekî kulfeteke pîr, çavî bi hêsir e,
Lava dike Xeca zerîn bibîne,
Dibe xewna xêrê Xecê ra tîne,
Duxwaze bê fita te bibîne,
Xewna xwe ya xêrê ber te birêjîne.

Heta wê rojê Xecê kes nediheband,
Nedihîşt firşteyê ezman herine hundur,
Nedihişt kesek here cem wê,
Lê wê demê emirkir pîrê bînine hundur,
Ewê dixwast heta roja xwe ya kutasiyê,
Ji merîyê kesîb û belengaz ra bike qencîyê.
Çaxê pîrê hate hundur, Xecê gotê:

Xecê:-Dayê, keremke tu nêzîk rûnê,
Ji dilê min tê kêrê xwînê,
Gilîyê min bêbextêy paşîn seke,
Ez pak zanim tu bona çi hatî!
Ev zêr û zîv min bûne berbatî,
Bi wan nayê kirîn dilê min şewitî.
Ewana êdî sibê min ra nelazimin,
Bibe bifroş, çi duxwazî bikir,
Lê car-cara wextê usa Xecê bîr bîne,
Ez xwe da dihêlim, evê pêşkêşa biqîmet,
Tenê evê gustîla biçûk, bi hurmet,
Lê tewaqe dikim, wextê min dikine ç'el,
Evê gustîla biçûk tilîya min dernexin.
Paşî vê gotinê hemû xemilê xwe existî,
Gelekî li pîrê nihêrî paşê da wê,
Pîrê li Xecê nihêrî bin lêva da keniya,
Nêzikî wê bû, çavê wê nihêrî û hemêz kir,
Enîya wê paçkir û hêdî gotê:

Pîrê:— Bira ew gilîyêd paşin nexêrxazê te ra bin
Qîza min a torin, zêr-zîv ji te ra bimînin.
Heger rastîyê duxwazî, kulîlka banîya,

Ji te ra min pêşkêşê biqîmet anîye.
Gustîla Sîyabend derxist û da Xeca zerîn,
Kesera giran, ji dilê wê dibarî.
Çaxê Xecê gustîlik dît bal wê,
Ji şabûna xeriqî li erdê.
Av anîn pê werkirin, xwe va hat paşê,
Heta nîvê şevê, tev wê delalê,
şîrîn xeberdida, pirs-gilî digote.
Êdî ronkaya berbangê vedibû şebeqê,
Paşê pîrê vegerya malê.
Çaxê ew hate hundurê malê,
Sîyabend çawa rûniştîbû, usa mabû,
Ji wî cîyî, tu dera da neçûbû.

Sîyabend çaxê pîrê dît, dil ditirsî,
Tev hev bû, ji pîrê pirsî:-
-De bêje dayê, te çi kir, çi nekir,
Te Xecê dît, gustîl pêva kir,

Pîrê hûr-hûr Sîyabend ra şirovekir.

Pîrê:— Xece bi lewzê şîrîn got,
şefeqa sibê ra ezê ser mezelê bavê xwe bim,
Bira Sîyabend bê bal min.

Sîyabend zû-zû çek girêda,
Kîsike zêr hîşt pîrê ra,
Bi merîfetî ew hemêz kir,
Çokda destê wê paçkir.
Bi şîrînî jê wê ra got:-

Sîyabend:— Silametî çavê te çavê kurê te keve!
Kurê te sax-silamet vegere
Tu û bûka xwe va pê şabin.
Dîya min jî cîkî dûr e,
Bêxayî-bêxudan e, tenêye,

Wan meskena kesekî wê tune,
Xweyîyê wê tenê, ez tayê têne me.
Dayê, wekî tiştek min biqewime,
Elamî wê ke, wekî fikirmeke,
Hêsira nebarîne û xema neke.
Bê kurê te timê kolosê wî qot bû,
Enîya wî fêrizî vekirî bû,
Temîyê dîya xwe tucara bîr nedikir:-

"Mêr dimire, nav dimîne,
şêr dimire, çerm dimîne,
Dinê da mêranî dimîne".

Herê Sîyabendê min î şengîn e,
Tîmarekê li hespê şê dixîne,
Lê dike zînê zerî mêrdînîye,
Teng û berê hespê şê dişidîne,
Lingê xwe dike zengûyêye,
Dide orta xwe û zînê zerî mêrdînîye,
Rima çarde movkîye-qesaye,
Hêdî-hêdî ber bi Xeca zerîn ajotiye çûye,
Ay sîyaro delalo, mêrxaso sîyaro.

Wextê gihîşte topik,
Ji hespê şê peya bû,
Berda, wekî hinekî biçêre.
Lê ewî zû-zû ber bi Xecê lezand,
Hevrazî serê topik dibû.
Ji alîyê topikî din da tev bilind dibû,
Tev fêza Xecê ra bilind dibû,
Wextê du teva, hev dîtin...
Gazî hev kirin:-

Sîyabend:— Xecê!..

Xecê:— Sîyabend!..

Pêra hev hemêzkirin,
Sûretê wan nêzîkî hev bû,
Wî halî da, wê çiqas bimana!..
Gelo kê zanibe, kê wê têderxista
Çaxê hespê şê kire hîrîn,
Xecê gote Sîyabend,— ruhê min,
Tu çima tek-tenê hatî,
Ez gele ditirsim bona te!
Ez diricifim, delalê min,
Ez dilerizim, mêrxasê min,
Rûyê min da ketî devê
gurêd vira.
Niha em çawa birevin
ji van dera,
Em çawa xilasbin ji destê
van xûnxwara?
Kesek ji haj me tune,
wekî em van derane,
Pak dibe, wekî em birevine
Serê çiyayê Sîpanê dûman e.
Emê rehet xilasbin
Van daw-dozan e.

Sîyabend bi merîfet destê xwe
Nav porê Xecê gerand,
Û bi peyveke nazik gotê:-

— Na, Xeca min a delal,
Torina min a kemal!
Ez naxwazim, wekî bêjin,
Dizbû, tirsonek, Xecê bi dizî va bir.
Kurê mîrê ereba,
Cerda xweyî giran va,
Qet tu cara nikare
Tu tiştî min bike.

Çimkî timê û timê
Kêleka min sekinîye,
Hezkirî-bawerîya min,
Xeca min a zerîn.

Xecê:— „Ez ya te me, tenê ya te.
Xweyîyê min û rûspîtîya min tuy!
Çi sondê dixwazî ez ji te ra buxwim,
Dixwazî em niha destê hev da
Li vira ber mezelê bavê min
Sonda temam bidin hev".
Herdu li ber mezel çok dan,
Sozê timam dan hev,
Wekî, çi bibe, çi biqewime,
Heta ewana rû dinê sax bin,
Timê ji hevra rastbin.
(Paşî sondê qewîn hev paçkirin).
Paşê Sîyabend Xecê
Avîte terkîya hespê şê,
Rast ajot ber bi cîyê
Deweta kurê mîrê ereba,
Çiqas ewana nêzîkî cîyê dewetê dibûn,
Hewqas def-zurne gur dibûn.

Êdî ro hatibû nîvro.
Temam dibû qirarkirina
Roj û sih'eta qewlê Xecê.
Çaxê zurnevan bi nazik qeydê
Bûkderxistinê lêda,
Wê demê Sîyabendê Silîvîya
Li hespê şê siyar, nola fêriza,
Xeca zerîn li terkîyê girêda,
Nola Ezrahîl, ajote orta dewetê.
Nêzikî defçî û zurnevan sekinî,
Civata govendê nikarbû famkira,
Kî alî va Sîyabend hate orta govendê.

Hemû şaş mabûn, çavê hev dinêrîn
Dinêrîn çek û sîlehêd Sîyabend,
şaş mabûn li xemil û forma wî.
Lê govendê bi eşq distira:

Hewşa me hewşa we da,
Tew lê-lê, tew lo-lo,
Min xwestîye, bavê neda,
Tew lê-lê, tew lo-lo.

Berê hewşê qulbeda
Tew lê-lê, tew lo-lo.
Min xwestîye, daykê neda,
Tew lê-lê, tew lo-lo.

Tilîya min çavî dêra,
Tew lê-lê, tew lo-lo
Mêr dîtîye qîza xwe ra,
Tew lê-lê, tew lo-lo.

Sibêye, tevê daye,
Tew lê-lê, tew lo-lo,
Zêra li enîyê xûdaye,
Tew lê-lê, tew lo-lo.

Sibeye, tev zeriqî,
Tew lê-lê, tew lo-lo,
Zêr li enîyê biriqî,
Tew lê-lê, tew lo-lo.

Ez hatime alyê we da,
Tew lê-lê, tew lo-lo,
Koç kerya rê me neda,
Tew lê-lê, tew lo-lo.

Sibêye, sibe nabe,

Tew lê-lê, tew lo-lo,
Keçik xewê ranabe,
Tew lê-lê, tew lo-lo.

Sîyabend hesp ajote nêzîkî
Defçî-zurneçîya û kire gazî:
-Lolo-lolo, defçî û zurneçîno,
Kesîbno û belengazno,
Hanê ji we ra kîskê zêra,
Def û zurnaxin, nola mêra.
Ew Sîyabendê Silîvîye,
Dest li cêvê xistîye,
Da defçî kîskê zêrê qazye,
Wekî sê denga têne gazye,
Boy şabaşa Sîyabendê Silîvîye,
Û gula Sîpanê-Xecê zerye,
Bira huba wan nolî tevê germbe!
Bira ew bimbarek pîrozbe.
Defçî ricifî, dil lê lerizî,
Gilîyê Sîyabend ew bû razî.
Û dengekî zîz vir kire gazî:

Defçî:— şabaş, sed bîst car şabaş,
Ser serê xort û qîza baş,
Mêrxas Sîyabendê Silîvî,
Mêvanê Xeca horî,
Bimbarek-pîrozbe mirazê we,
Bira şayî û bext bin emrê we,
şabaş, sed bîst car şabaş!

Paşî şabaşê Sîyabend zivirî
Ber bi civata girane guhdarî,
Û gote wana bi mêranî:
-Civata qenç, de ma xatirê we!
Kîjan ji we hatin-çûyîna me
Neraziye, bira ew poşman be.

Paşî wê gotinê hespê şê
Ajot ber bi çîyayê Sîpanê,
Li pey wan civatê kire gazî,
Kirina we bimbarek û pîrozî,
Derbaskin hergav eşq û bextewarî.

Herê Sîyabendê min î şengîn e,
Zenguyê li hespê şê dixîne,
Hedî-hêdî ber bi Sîpanê ajotiye çûye
Ay sîyaro, delalo, mêrxaso egîto.

## PAR IV

Cab digihîje kurê mîrê ereba,
Wekî Sîyabend Xecê ro-nîvro,
Ji nava êla ereba bir.

Çaxê kurê mîr ev cab sekir,
Ji harbûna kef li dev ket.
Hêrsa hemû tişt hîşt,
Bi xulamêd xwe va pêy wan ket.

Birê Xecêy mezin, pêra-pêra,
Emirî ser birêd xwe kir,
Wekî herine pişta kurê mîr.
Lê Qereman û Tihar xeberê wî nekir,
Yê mayîn jî xwe paşda girtin.

Tihar:— Hergê kurê mîrê ereba mêre,
Hêjayî Xeca xwûşkîne zere
Bira tenê here şer.
Hergê dikare, bira tenê
Bi mêranî xwe ra bîne.

Mîrê ereba defa hewarê dixîne,

Mêr û mêrxasê êlê dicivîne.
— Gelî mêr û mêrxasê êlêye zor,
Bikin-bilezînin, hespa derxin jor
Lêkin, teng û bera bişidînin,
Xeca zerîn jê bistînin,
Serê wî ji min ra bînin!

Sîyabend hela negihştîbû çîyê
Sîpanê xelatê, gul-sosinê bengîyê.
Kurê mîrê ereba bi hêrsî,
Xulam xizmetkarê xwe va bi lezî,
Li ser pişta hespê kihêlî,
Nêzîkay li Sîyabend kirin,
Sîyabend dengê hespa sekir,
Xeca zerîn nihêrî, jê pirskir:-

Sîyabend:— Xeca min a nazik û biqîmet,
Delal û torina min a bihurmet,
Siyarê pêşêy bilez tê, kîye?
Wê dilîvîne, nolî gurê birçîye.
Dilê Xecê zû-zû lêda,
Xecê nihêrî û caba wî da:-

Xecê:— Sîyabendê min î bêsaw û delal,
Tu erfûtê min î bêtirs û kemal,
Siyarê pêşin ew e, yê ku îro
Te Xecê jê stend nava nîvro.
Ew kurê mîrê eraban e,
Wî daye pey me nolî guran e.

Çaxê Sîyabend bihîst ev xeber,
Lê şewitî dil û ceger.
Dît peyketî ne birê Xecê ne,
Hespê bin wana da teve şên e.
Pêra-pêra hesp da sekinandinê,
Xecê ji hespê da peya kirinê,

Ser çayrêd şîn da rûniştandinê,
Nêt û fikira xwe bal wê hîşt.
Germa dilê xwe lê kire lêmişt.
Rima çarde movkî rengîn e,
Da orta xwe û zînê mêrdîn e,
Hespê şê ajot û zengûkir,
Rikêbî ser kurê mîrê erabakir.
Kurê mîrê ereba Sîyabend kire gazî,
Ku Xecê sax û silamet bide wî,
Xwe jî bê rayê û bibe berdestî,
Wî çaxî ewê wan azake mêranî.

Sîyabend gotê:— mêranî ne terazû-mêzîn e,
Tu bixwe, paşê bişêkirîne!
Ez heme Sîyabendê Silîvê me,
Kilê çavê Xeca zerî me,
Derba min mêra xistîye,
Tu doxtir-hekîm nacebirîne!
Xecê min ra bûye bermalî,
Tu cara nagîje te dewarî,
Pak dibe tu îro para vegerî!

Kurê mîrê ereba gava ev gilî sekir,
şûr tezîkir, xwe dirêjî Sîyabend kir,
Bû şingîna mertala, reqîna şûra,
Herdû gihîştîne hev, nolî du hûta.

Sîyabend we'de wunda nekir,
Zengû li hespê da, kurê mîrê ereba
Serê niza çarde movîkî va kir
Li ser serî erdê werkir.
Çaxê xulam û cerda mîr,
Ew yek ber çavê xwe dîtin,
Dest-xwe da Sîyabend naskirin,
Çekêd xwe avîtin û teslîmbûn.
Sîyabend ew aza kirin,

Wekî bigîjine jin û zarêd xwe.
Lê wî Xecê dîsa avîte terkîya xwe

Ber bi çîyayê Sîpanê ajot,
Xwe ra distra û kilam digot.
Çaxê ewana gihîştine şaxêd çiyê
Sîpanê bedew, wan ra dikeniya
Palê wê gul-sosina va dixemilîya
Bi cûre-cûre nola şer-şmaqîya,
Nolî gogerçîna hevra dikeniyan.
Li cîkî rast hespê peyabûn,
Sekinîn, wekî hinekî rihetbin.
Sîyabend li ser çayîrê eba xwe
Bi nazikî raxist, nolî doşeka,
Evîna wî, û ew nola kewêd gozel,
Li ser ebayê rûniştin,
Bi lêwzêd şîrîn hevra gilî kirin.
Sîyabend şirovekir çi hatibû sere wî.
Xecê şirovekir, çawa birêd wê
Wan ra bêbextîya mezin kirin,-
Nebûne xweyê sozê xwe mêra.
Çawa Qereman pişta wan bû,
Bi çi cefakî çil şev û rojî
Fîncana jehrê va, tenê nav avayî da,
Dayina sozê xwe venekişya,
Gumana xwe tu car nebirî,
Hêvîya Sîyabend kutasîyê sekinî.
Paşî xeberdanê Sîyabend
Tewaqa ji Xecê kir,
Serê xwe dayîne ser çoka wê,
Qasekê wira şîrînî razê.

Sîyabend:— Xeca min, delala min!
Dilê min, evdalî dibêje,
Îro çend roje û şevêye
Minê nekirye xewa sibêye,

Ezê serê xwe bidime ser çoka teye,
Lezekê bikevime xewa sibêye!

Xecê:— Erê, Sîyabendê min î şengîn e,
Delalê min î şengîn e.
Te eva çend roje nekirye
Xewa sibêye şîrîn e.
Tu serê xwe bide ser çoka min e,
Qasekê bikeve xewa sibêye!

Sîyabend serê xwe da ser çoka Xecê,
Lezekê şûnda hêdîka çavêd reşên westîyay girt,
Kete xewa sibêye şîrin
(dengê bilûra dihat,
"Bihara bextewar").
Sîyabend raza,...
Rengê wî rihet û edilî,
Sîyabend kete xewa şîrin.
Sîngê wî fire rihet bîn dikişand.
Meriv tirê ew xewnê da dikene,
Hêsabe ji mitalê bextewarî,
Zîpikêd xwûdanê sera avîtî.
Serê wî ser çoka Xecê,
Rihet, xewa sibêye şîrin da,
Ewî tirê, hewa, çiya û gelî,
Gul û kulîlk, deşt û zozan,
Avêd çavkanîya pêl didin dikşin,
Ji qûntarêd çiya û berfêd belekiya
Timam ji wan ra emir tînin,
Wan ra şadibin û bi eşq dikenin.

Biharbû, lêylan ketibû erdê,
Xecê bi çavêd reşe bedewî,
Nola maşoqa timî Sîyabend dinhêrî.
Dinhêrî rengê wî yê eşqî guldayî,
Porê wî kurîşk mizdida,

Kilameke zelûlî stira:-

Ber min Sîyabendê min gulday,
Ser min ra ezmanê şay,
Min nizanibû bagera ser min wê derbasbe,
Dû wê ra ser min bibe çîk say!
Bê wext gulê neçirpîne, ew guneye,
Gula bişkivtî mirazê min û teye,
Tevî Sîyabend hezdikî herime cehnimê,
Bo min, ew cineta lap qeydeye.
Çiqas ba neyê, nelûvîne,
Çiqas gurêd çiya nezûkîne,
Wekî dil dila hezbike,
Dest hubê tu tişt wan natirsîne.

Min hîştîye şeneşînê rengîne,
Konê mezin, mala girane defîne,
Ez nizanim dizgîna sura dila,
Na welle, bextê cahil me kuda bişîne.

Xecê mişkêva dengê xwe birî.
Çaxê bedena topik nihêrî,
Nogineke kûvî hevraz dibû û direvî.
Ji wê tirê ew nêçîrvana direvî.
Pey wê rêz bûbûn şeş gakûvî,
Ewana hela nêzikî topik nebûy,
Meriv tirê wê qezîyayê xilas dikin.
Nola xewnê nedîva wê ra derket
Gakûvîkî bedewî, cahilî çavxwîn,
Bi şerekî nedîtî orta gakûvîya da
Ewî berî her şeş gakûvîya da.
Nogina kûvî ji wan dûrxist,
Da ber sîngê xwe, çû ber bi çiyê.
Ji wê yekê dilê Xecê tijîbû,
Ji çavê wê yê reşe nola tirî,
Hesirêd zelal nola kulîyê berfî,

Jor da ser gulê sûret da hatine xwar,
Xemla sûretê wê qayîrand.
Ew hêsirêd wê yên nola tirî,
Du hev ji sûrtê wê gulol bûn,
Ketine ser sûretê Sîyabend.
Ji wê yekê Sîyabend xewê vecniqî.
Ewî xewxî bû, û wî tirê,
Hewa hatye guhastinê,
Ewr-ezmanina baran dibare;
Tevyê baranê ser wî digere.
Lê çaxê çavê xwe vekir, wira
Çîk sayîbû li ezmana.
Ewra bengzê ezman nekirin xurî,
Li sufetê Xecêy nazik nihêrî.

Çavên we yên reşe nola tas şilbûn,
Dilê Sîyabend wira diqusî.
Sîyabend berxwe ket, ji Xecê pirsî:-

Sîyabend:— Xecê, delala min, çima digirîî?
Sûretê te sor bo çi xayîrî.
Xecê nexwest me'nê wê bêje,
Gilîkî din ber Sîyabend dibêje:

Xecê:— Qet, tiştekî usa tunîne,

Sîyabend:— Çawa qet, meriv
Bê me'nî digirî?
Tiştek qewmiîye,
Lema tu digirîî.

Dibe tu poşman bûyî
Bi min ra revîyayî,
Hatî van erda xalî?
Heger tu ketî dudilî,
Ezê para vegerînim, Xecê zerîn,

Bira dilê min bive kul û girî.
Xecê tê derxist, wekî
Hêrsa Sîyabend gelek rabûye,
Çi ku dîtibû, wê gote Sîyabend.

Xecê:— Çi ku min dît,
Ew nola serhatê min û te bû.
Ew şeş gakûvî cerda
Mîrê ereba bû,
Gakûvîyê cahil tu bûy, Sîyabend,
Lê nogina kûvî ez bûm.
Bona wê yekê jî dilê min
Tijî bû, ez girîyam.
Sîyabend serê xwe hejand:-

Sîyabend:— Ay-ay Xeca min, nazika min,
Ez beranberî gakûvîkirim,
Bona wê yekê ez gerekê
E'se ewî bukujim,
Dilik û gurçikê wî te ra,
Pêşkêş bînim.
Paşî vê gotinê Sîyabend
Pêra-pêra rabû sekinî.
Lê ricaf kete dilê Xecê,
Ew ji cî rabû, Sîyabend girt.
Xwe avîte pêsîra wî,
Jê kir lava û hêvî:-

Xecê:— Sîyabend, delalê min,
Xwey û xudanê min,
Roj û hawarê min!
Were vê yekê neke,
Neçe, pey gakûvî nekeve!
Yê du dila jev diqetîne,
Timê qezîya tê serî,
Were neçe, Sîyabend, neçe,

Bira ew mirazê xwe şabin,
Bira hizkirinê bidin û hizkirin bistînin!
Were naçe, bira ev xeta
        Ji te dûrbe, heta-hetîyê
Sîyabend, were veger, neçe,
Delalê min, torinê min, were neçe!

Sîyabend xeberê wê nekir,
Tîr û kevanê xwe hilda,
Pey gakûvî ket,
Gakûvîyê cahil ewî dît,
Diha xurt lez ket,
Ser kevira ra banzdida,
Ji gelî û zinara ra banzdida,
Kete nav mêşe, derkete
                cîyê rast û dûz,
Dîsa berê xwe da çiya,
                gelîya, banîya.
Sîyabend gele westîya,
Bûbû av-xûdane da,
Cîkî eba xwe avît,
Cîyê dinê kincê xwe avît,
Bezîya û gele bezîya
Heta wî çaxî, çi çax,
Ku gakûvî westand û zerê asêkir.
Wextê gakûvî sekinî,
Wî çok da erdê zimzimî.
Paşê çû hindava darê,
Tîr-kevan anî xwarê,
Nîşan girt, hesabê mêra,
Tîr avît pêra-pêra.
Gakûvîyê cahil erdê ket,
Bû e'orîn, mêşê ew hingavt.
Stûyîye gakûvî zerê da dalqîya,
Sîyabendê Silîvî ber bi wî bezîya.

Ser serê gakûvî ra sekinî,
Kêr derxist, Sîngê gakûvî birî,
Wekî dilkê wî germ Xecê ra bibe.
Nişkêva gakûvî serê xwe bir-anî,
Sturîyê wî kete pêsîra Sîyabend.
Ewî Sîyabend zerê da avît,
Sîyabend ser piştê li çiqilê darê ket,
Û çiqil pişta pîlê wî ra derket.

Xecê gelekî sekinî, difikirî,
Digot,— Sîyabendê min, tu kengê vegerî?
Lê Sîyabend hela nediziviri.
Saw kete dilê Xeca zerîn
Ew ricifî, çar hatibû birîn
Rabû bê eglebûn Sîyabend gerya.
Gele gerya, hindik gerya.
şopa Sîyabend bi çetinî dît,
Pey şopa wî ket, bi lez çû,
Gele çû, xûdanê sera avît.
Dûr va li qûntara çîyê, ser zerê
Cendekê gakûvî dît.
Gihîşte serê zerê,
Kêleka cendekê gakûvî
Tîr û kevanê Sîyabend dît.
Çokê wê sist bûn,
Çavê wê reşeva çûn,
Xûdana sar sera avît.
Bi dengekî beyanî kire qûjîn,
Hêsir nola cewêd kanya
Ser sûretê wê da kişyan.
Digerya, dilûband, hêsir dibarand.
Nişkêva nalîna Sîyabend zerê da sekir.
Xecê ser zerê da kûz bû nihêrî,
Dît, wekî Sîyabend ser piştê
Li çiqila dara çama ketîye,
Serê çiqilê sîngê wî ra derketîye,

Nalînê Sîyabend dihat gelek kûr
K'alîn kete Xecê-girya,
Tirê agir ser Xeca bêbext da barya,
Pirîskê agir ji dil dipekya
Destê wê sist bûn, qidûm şikest.
Ber çavê wê bû tarî,
Nizanbû çi bikira,
Ku Sîyabend ji wir xilaskira.

Xecê:— Sîyabend, ev çi zulum bû,
Te anî serê min bêbextê?
Way li min, bavo-birano!...
Te çira dujmin şakirin,
Wey li min bêbextê.
Niha ez çawa te xilaskim?
Gulîyêd xwe jêkim bavêjim,
Nava te, wekî zerê derxim.

Xecê go:— Serê Sîpanê xelatê wê bi mij e,
Ba rabiye, baran e pêra guje-guj e,
Kê sekirîye, kê bînaye,
Nêçîr nêçîrvanê xwe bukuje.

Sîyabend bi dilê birîn go:-
-Erê, Xeca min a zerîn e,
Bese bigirî, bilûbîn e,
Hêsira ser sûretê sor da bibarîne!
Sîpanê xelatê tê sureke sar e,
Bîna wê wêranê çi xedar e,
Wê gulê sûretê te bike birîndar e.

Xecê go:— Sîyabendê min, tu menal, menal.
Ez emrê xwe te ra têkim berpal,
Ez jî negirîm, nelûbînim,
Hêsra nola tevîyê baranê nebarînim.
Wextê nalîn te tê,

Girîyê min tê,

Delalo, nalîn te tê,
Dil-cegera min xwîn tê,
Tu menal, ez jî negirîm!

Sîyabend go:-Sîpanê xelatê wê bi mil e,
Gul, sosin hevra dikimil e,
Birîna min evdalî zehfe kûr e,
Dayka min maye bê xweyî û xudan e,
Çiqas çetin e, ew çi kul e.

Xecê go:-Gakûvîyo, stru mezino,
Sturu weke bejna mino,
Bira te male xirabbe
Kê sekirîye, kê bînaye, wekî
Te serê Sîpanê xelatê,
Jev kirîye destê mêr û jino!

Sîyabend go:-Xecê, qurba, tu megirî,
Hêsira ser sûretê sor da nebarîne,
Tu bîne werîsê heft malan e,
Bîne gulîya heft zerîyane,
Bavêje li zerêye, belkî tu
Min xilas bikî ji vê derêye,

Xecê go:— Sîyabend, malê me zozana danîne,
Ezê çi bikim, çi bicêrînim,
Ezê werîsê heft mala ji ku bicivînim,
Ezê gulîyê heft zerîya ji ku bînim,
Wekî te ji zerê derînim.
Birîna dilê xwe bicebirînim.

Sîyabend go:-Ezî birîndarim, birîna min xedar e,
Ne Hekîm e, ne jî komekdar e,
Xecê, bes e ewan hêsirê sar e

Ser sûretê sorda bibare,
Hilbet halê min bê hewar e.

Xecê go:— Gakûvîyo, ga biçûko,
Te sturu nola bilalûko,
Bira te male xirabbe,
Te çawa serê Sîpanê xelatê,
Jev qetandiye destê zeva-bûko.

Sîyabend go:— Gola Sibhanê kûr e,
Têda digere masîyê hûr e,
Xeca min, nazik e û delal,
Here mala bavê, te ra destûr e.
Megirî Xecê, tu megirî,
Megirî delala min, tu megirî.

Xecê go:— Menal, Sîyabendê min, tu menal,
Ezê te ra bivme berpal,
Nalînê te tê, giryê min tê.

Sîyabend go:— Xecê can, were megirî,
Delala min, were megirî,
Kilê Sibhanê ji çavê
Reş û belek meke xalî.

Xecê go:— Sîyabend, delalo, ez çawa negirîm,
Negirîm çaxê nalînê te
Kûr û dûr tê, girîyê min
Por-kurê, nola tevîyê baranê tê.

Sîyabend go:— Xecê delalê, gakûvî bihurî,
Wî ez avîtime kendalê kevirî,
Were tu îro megirî,
Xilasbûna min tune ji vê zerê
Eynê bide ber nederê
Belkî kula min ji dilê te derê!

Xecê go:— Sîyabendo qurban, tu Sîyabendê Silîvî,
Tu xweyê tîr kevan, zer û rindî,
Çawa gakûvîyê bêrem tu kirî zendî.

Serê Sîpanê xelatê dar şiqitî,
Çilkê xwîna Sîyabendê min niqitî,
Dilê min bêbextê şewitî.
Menal, Sîyabendê min, menal,
Kesek tune te ra bibe belgî-berpal.

Sîyabend go:— Serê Sîpanê xelatê wê bi mij e,
Binê Sîpanê xelatê wê bi mêşe,
Xecê, sîngê min û dilê min tev dêşe,
Hekîmekî bîne, wekî birîn neêşe.

Xecê go:— Sîyabendo, min got, were neçe,
Felek xayîn e, min û te ra qal û pevçe,
Nêçîra vê biharê bêawiye
Te ez tenê hîştime van çîyaye,
Min ne xudane, ne xay e,
Ezê hêsîr û tenê mame,
Menal, Sîyabendê min, menal,
Menal, delalê min, menal.

Serê çîyayê Sîpanê wê bi dar e,
Xeca teyê li vêderê tenê zare-zar e,
Ez nikarim jor da bême xwar e,
Ji Sîyabendê xwe ra bibime belgî û berpal e,

Sîyabend go:— Xeca min, megirî, melûbîn e,
Delala min megrî, melûbîn e,
Hêsira bese ser sûretê sor da bibarîne,
Serê Sîpanê xelatê berf e, dûman e,
Tu ji min ra bîne gulîyê çil qîzan e,
Ez, tu nava du denada bibine

Mêvanê êla Silîvîyan e.
Megrî, Xeca min, megrî!

Xecê go:-Sîyabendo, qurba, ba tê, baran pêra dilîlîne,
Kê ji me bêbexta ra gulîyê çil qîzî bîne,
Wekî bavêjme navkê te, derînim.
Menal, Sîyabendê min, menal,
Ez, por-kur, çawa nikarim te ra bibime berpal.

Sîyabend go:-Xecê megirî, delalê megirî
Heyfa minê nayê canê min î cahilî,
Heyfa minê têye, çavê te yê belekî,
Sura Sîpanê sar e, wê wan biqarîne.

Xecê go:-Çîyayê Sîpanê xelatê wê bi mil e,
Avêd cew-kanîya jor da xule-xul e,
Gakûvîyo, bira te male xirabbe,
Teyê çawa terbandîye, raw-tivdîr e.

Sîyabend go:-Xeca min a remoşî tuyê serê Sîpanê
Tu ji min ra şîrê mîya bidoşe,
Bese bigirî, bilûbîne, hêsira
Nola te'vîyê baranê ser sûretê da bibarîne..
Ew dunya hanê dinyake boşe betal e
Kesîra nemay, xêra min jî te ra tunîne.
Sîngê Sîpanê xelatê wê bi strî,
Tu were bona xatirê birîna min negirî,
Hergê heval dipirsin, tu bêjî
Min serê Sîpanê wunda kirîyê lawkê xweyî rû xurî.

Xecê go:— Sîngê Sîpanê xelatê wê bi dar e,
Rê tune, wekî ez zerê da bême xwar e,
Minê birîna te bişûşta bi pêçîyê zer e,
Wekî te nekira zare-zar e
Ji destê birîna xweye kûre-xedar e.

Sîyabend go:-Pala Sîpanê xelatê wê bi dirî,
Xeca min, nazika min a bi gulî,
Tu bêbext bûyî, tenê may rûbxêlî,
Bes e bigirî, bilûbîne,
Hêsira ser sûretê sor da bibarîne.

Xecê go: Çîyayê Sîpanê xelatê bi gul e,
Avêd kanîya tê xule-xul e,
Ez çavê xwe digerînim nabînim,
Sîyarê hespê qul e.

Sîyabend go:-Xecê, ez peritîm nava kula,
Ew kul kûrîn ji hemû gola,
Tu kanîya tev qîza
Boy min timê huba dila,
Ez bejna te mame tima.

Sîyabend go:-Ro çûye ava, kerî sekînîne guhêra,
Tu şîvê çêke ji min ra,
Ewrê reş kimkimîne ezmana,
Bextê me sar bû, nolî dûmana,
Kula dilê min zef kûr e,
Vegere mal te ra destûr e.

Fayda min te ra diha tunîne,
Tu tişt min te ra venagerîne,
Nav êla we da xort gelek hene,
Lê nava wan da gelek qure ne,
Temîyê min te, yekî bibîne,
Bira layîqî nevsa canê te be.
Negrî, Xeca min, negrî,
Negrî, delala min, negrî,
Girîyê te tê, nalîna min tê.

Xecê go:-Sîyabend, nede min tu wan tena,

Xênî ji nevsa Sîyabendê Silîvê,
Xecê nabe xurê tu kesane.
Sîyabend:Xecê ez birîndar im, birîna min xedar e ,
Dunîalik bona min boş e û betal e,
Wextê nêçîrvan şaxê Sîpanê digerin,
Wê pirsa min ji te bikin,
Bê Sîyabendê min, cenûke nivzîn sîyar e,
Li şaxê Sîpanê pey karê xezala digere.
Negirî, Xeca min, negirî,
Negirî, delala min, negirî.

Xecê go:-Sîyabendo, qurba, kanê rojê buhirî,
Lêmişt rabû, bextê me xwe ra birî
Vê sibê gula Sibhanê temirî
Bê xwey, bê xudan dinalî.

Çawa şev û ro dihate guhastin,
Çawa qiravî ser çayîra rûdinişt,
Çawa gelî tijî mij dibûn,
Dilê Xecê tijî kul dibû.
Wê nedidît, çawa deşt û zozan,
Dixemilîn, bi gul û kulîlka,
Çayrêd şîn û rihanêd bîn,
Dizî va bi hevra vedikin.
Dilê xwe hevra vedikirin.
Çi hesabî ji sîngê Sîpanê
Avêd çavkanîya, berfêd belekîya,
Bi eşq jor da dikirine xule-xul,
Hevra dikenîyan, dihatne xwarê,
Xenî ji xwe kesek nedidîtin.

Çaxê birêd Xecê bihîstin qezya,
Hatibû serê Sîyabendê Silîvî,
Pêra-pêra hatine hewara wan.
Ewana gele li Xecê geryan,
Li serê Sîpanê cî nehîştin,

Hatibû serê Sîyabendê Silîvî,
Pêra-pêra hatine hewara wan
Ewana gele li Xecê geryan,
Li serê Sîpanê cî nehîştin,
Lê li serê zerê Xecê dîtin.
Ew gele halekî girandabû.
Çaxê Xecê bira dûrva dîtin.
Xwe avîta pêsîra wan,
Bi zelûlî gele girîya.
Tewaqe kir ji bira,
Wekî bikin hemû mecala,
Sîyabendê wê xilaskin wan dera.

Birêd Xecê gelek çerçirîn,
Wekî bona Xecê Sîyabend xilaskin.
Lê tu çar û mik'an nedîtin.
Sîyabend pak fam dikir,

Wekî we'dê mirina wî
Gele hindik maye,
Bi dengê zirav tewaqe
Ji birêd Xecê kir.

Sîyabend:— Birêd ezîz, êdî cefê nekşînin,
Dibe nivîsa min da wa hebû.
Min vir rihet bihêlin,
Zef razî me ji birêd xwe
Bona hurmetkirina we.
Bibaxşînin bona zemetê we,
Ez ji we tenê tewaqe dikim,
Soz bidin, wekî hûnê wê biqedînin.

Bira soz da, wekî kerr-lal
Tewaqa wî biqedînin
Çi cûrey ma be, e'se biqedînin,
Gilî û temîyê Sîyabend.

Sîyabend:— Tewaqe ji we dikim,
Çi cûreyî ma be, Xecê bibin.
Wekî ji derd û xema
Gulêd sûretê wê neçilmisin.
Wekî enîya wê nazik, nolî bîyoka,
Nebe meydana qirçimoka.
Wekî ew êdî emirê xwe da
Derda û kêmasîyê nebîne.
Eve tewaqa min ji we.
De herin, we ra oxirbe,
Ewî stûyê xweyî bedew xwarkir,
Bi çavên xwe yên reş, wan mêzekir.
Axînek hatê pêda kewgirî
Heta-hetayîyê dengê xwe birî...

Xecê ji cîyê xwe nedihejîya,
Sar bûbû, sêfîl li bira dinêrî,
Tiştek nedidît û senadikir.
Nizanibû dora wê çi diqewime,
Metal û sexîr, çavêd xwe
Ji wê zerê û Sîyabend nedibirî.

Lê bira wira mabûne dudil,
Ew kula Xecê, wan ra jî bû kul,
Ewana hêdî bi hev şewirîn,
Hûr-mûr topkirin, Xecê hildan,
Ketine rê û çûn.
Xecê bûbû kevir, nizanbû çawa,
Ew li hespê kirine,
Ew ji Sîyabend dûrxistine.
Nişkêva çaxê rê da hate ser xwe,
Wî çaxî famkir, çira ew dibirin.
Ew siyarkirine û kuda dibin?..
Dibin teze bifroşine yekî dinê...
Yan bidine begekî, yan axakî,

Dibin ewê teze bidine mêr?
Usa fikirkir û xwe xwe ra digot:-

Xecê:-"çî mira ne e'mrê defîne,
Dewlet, zêr, zîv û xezine,
Wekî dilê min î etîm,
Ne dikare rihetbe, timê tî,
Ez paşî Sîyabend sax vegerim?..
Ez teze mêrekî din bistînim ?..
Ez bibim bermalîya yekî din?..
Na, ev yek nabe, tu cara nabe!
Na, ev yek tucara nikare biqewime,
Ez gerekê paşî Sîyabendê Silîvî,
Mêrxasê-mêra, xemla govenda,
Delalê dilê xwe nemînim dunê".
Ew vegerya ber bi birêd xwe,
Tewaqa kir û gote wana:

Xecê:— Birêd mine helal û biqîmet,
Min ser zerê hîştîye pêşkêşa Sîyabend.
Min ew pêşkêş wira bîrkirîye
Xwe eglekin, ezê pêşkêşê hildim,
Pêra-pêra xwe we ra bigihînim.

Xwe serê zerê ra gihîand,
Li Sîyabend kire gazî:-

-Sîyabendo, naziko, mêrxaso, delalo,
Siphan golê wê bi dar e,
Tu xwe bigire, ez porkurê,
Jor da bême xar e.
Heta hetayê te ra bibime heval e.
Paşî vê gotinê Xeca zerîn
Sîngê xwey mermer vedike bi nazî,
Vedike gulîyê xweye dirêje,
Xwe jor da zerê da davêje.

Sîngê wêy zer li darê dikeve,
Dar pişta pîlê wê ra derdikeve,
Ew Sîyabend qayim hemêz dike,
Meriv tirê dixwaze wî hişîyarke,
Dar dişkê û du bende tayê rihanê
Dikevine nav gola Sibhanê.

Sîpan, Sîpan tu kubarî,
Tu bedewî ji qurnanî,
Êl û mesken hemûşk hersal,
Te dipirsin, keser bêmal.

Tu şade zewala dinê,
Ruhê Sîyabend, dilê Xecê,
Ku herdu çûne ber mirinê,
Û bûne ax ji birînê.

Bi dilşikestî distirê bilbil,
Ku nêçîrê kuşt nêçîrvan,
Bin perê te, Sîpanê delal,
Ew bûn du gul ji huba dil.

Hêşîn dibin ew her bihar,
Dibin nolî agir husul-cemal,
şewqê dide, ji şewqa te,
Royê delal, tuyî hergav kubar.

Çaxê bira wê qezyê hesyan,
Nolî şimayê xwe da dihelyan.
Giryan û serê xwe dan,
Teze famkirin hezkirina wan.
Êdî dereng bû bona wan,
Ewan pos-posîde para vegeryan.

**15 X 1958**